Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1298 13-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê 5 cihên şûnwariyê...(2)




**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi dehan cihên dîrokî ku dîroka wan vedigere hezarên salan, hene. Her cihek xwedî şarestanî, nirx, çand û dîrokeke. Ji van cihên şûnwariyê devera Goristana Elentabî, Gorên Romanî, Eyndara, Çiyayê Xalid û Gorên Şaş Hemedan e.**

**Goristana Elentabî (Elfirîsk):**
Goristana Elentabî li devera goristanên Taxa Rojihilatî cih digire. Ev goristan ji cureyên goristanên binerdî ye. Ev cure goristan di serdema desthilatdariya Bîzentî de (çerxa çarem û pêncem ên zayînê) pir belav bûye. Ev cure goristan bi awayekî olî yê sade hatibûn dîzaynkirin. Ew ji hin pêpilkan û hevbirîna meazibên gorkirinê bi awayekî xaçî, pêk tê. Herwiha li ser dîwarên wan goran wêneyên ku mirin, mayîn û rêveçûna ber bi jiyana dawî ve nîşan didin, hatibûn nîgarkirin. Di heman demê de teşeyên geomtrîkî û wêneyên şînatî û lawirên ku li goristanê habûn bi nikarê(cisê) û bi rengên xwezayî, dihatin çêkirin.

**Gorên Romanî:**
Gorên Romanî li aliyê başûrê rojhilatî Minbicê bi cih dibin. Dûrbûna wê ji şûnewarên Eladiyatê ya ku Desteya Şûnwaran beriya du salan kar tê de kiribû, mîna dûrbûna wê ji Minbicê ye. Ew di nava malan de cih digire; ev mala li Taxa Ebû Mûsa Eleşerî ye.

**Eyndara**
Ev bajarê şûnewarî li rojavayê gundê Eyndara bi dûrahiya kîlomitreyekê cih digire. Herwiha 5 kîlometreyan li başûrê bajarê Efrînê ye. Li derdora wî ji sê aliyan ve zeviyên berhembar hene. Ji aliyê rojava ve bi dûrahiya çend sed metreyan Çemê Efrînê diherike. Kaniya Eyndara heye ew ji gola wê ya biçûk riya xwe distîne û li rojavayê gir dikeve nava Çemê Efrînê. Ew cihekî dîrokî ye. Li ser riya ku Heleb, Ezaz û Efrînê bi hev ve girê dide, cih digire. Ev bajar vedigere serdema Aramî hezar û 200 sal heta 740 sal berî zayînê. Ev bajar di dema niha de ji şûnewar, perestgeh, peykerên cihêwaz ên ku nimandina jenawerên biçeng, peykerê Ebû Elhol û neqş û gelek şûnewaran dikin, pêk tê. Di heman demê de li vi cihî tabloya baziltî ya nimandina xwedawenda Eştar dike, hat dîtin.

**Çiyayê Xalid**
Ew 2 heya 3 kilometreyan dikeve başûrê Bendava Tişrînê. Ew li rojavayê berava çemê Feratê cih digire. Cihê wê yê erdnîgarî li ser xêza dirêjahiyê 5183 rojhilat – 2263 bakur e. Ev cihê dîrokî li ser zozanekî latî ku dirêjahiya wî ji aliyê bakur heta başur 2 hezar metre ye û ferehiya wê hezar metre ye û rûbereke nîzî 50 hiktarî digire. Li hêla din bilindahiya wê digiheje 427 ji deryayê. Lûtkeya zozan li hêla bakurî gelekî berjêr e û ev berjêrbûn li aliyê rojhilatî bêhtir e. Berê vî zozanî bi aliyê Çemê Feratê ve ye.

**Goristanên Şaş Hemdan:**
Ev goristan li qeraxa rojava ya Çemê Feratê dikeve. Ew di nişûveke kevirî de kolayî ye. Berê wê li rojhilat-rojava ye. Ji ber ku ava Feratê derdora wê bi nav kiriye, mirov ancax bi gemiyê bigihjiye wê. Herwiha gelek goristanên din li ser wê nişûva kevirî ya navborî hene û li ser dirêjahiya qeraxa çemê Feratê ya navborî belavkirî ne. Lê belê ev goristan xwedî girîngiyeke taybet e çimkî ew ne goristaneke bi wateya wê ya rastîn e, lê ew holeke ku tê de rêûresmên miriyan dihatin pêkanîn. Xuya bû ew rêûresm girêdayî herêmê bûn. Em bi riya cihê goristanê û awayê avakirina wê û tiştên ku dihewîne ku tevahiya dîwarên wê mijûl dikin, digihêjin vê rastiyê.

# Bi hezkirin û sebirê.. du hevjîn bi hev re nanê tenûrê çêdikin

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

**Di bin roka gerim ya meha Tîrmehê û agirê Tenûra gur de, Yûsif Cuma ji bajarê Qamişlo karê xwe yê rojane di çêkirina nanê Tenûrê bi hevjîna xwe re dike.**

Li aliyekê ji kolanên bajarê Qamişlo, Yûsif Cuma li pêşiya tenûra xwe ya ku bi destên xwe çêkiriye disekine, hilma nan û dûmanê li derdora wî belav dibe, berî derketina rojê dema ku pileya germahiyê hîn kêm e, dest bi amadekariya hevîr û pêwistiyên nan dike. Bi bilindbûna pileya germahiyê ya rojê de, di navbera agirê tenûrê ji aliyekî û germahiya rojê ji alîkî din ve karê xwe berdewam dike.

Yûsif Cuma bi dengekî ji xwe bawer dibêje: "Roj li ser serê me ye û agir li pêşiya me ye, lê ruxmê hemû zehmetiyan jî em debara xwe ji vê



pîşeyê dibînin, karê me pir zehmete, bi taybet di werzê havînê de. Lê em neçar dimînin ku vî karî bikin, ji ber ku em debara xwe bi vî karî dibînin û ev kar çavkaniya jiyana me ye, ez serbilindim ku hîn bi destên xwe kar dikim û bi rûmet pariya nanê xwe peyda dikim.

**Cuma û hevjîna xwe bi hev re pariya nanê xwe peyda dikin**

Cuma Yûsif ne bi tena xwe kar dike, lê hevjîna wî pê re dibe alîkar û bi hev du re karê xwe temam dikin, bi hev re diwestin û debara xwe peyda dikin.


Cuma wiha dibêje: "Hevjîna min alîkariyê bi min re dike, di bin konekî nêzî tenûra ku me çêkiriye hevîr dike, di heman demê de ez nan li ser tenûrê çêdikim."

Cuma Yûsif berê di zirêqa de dixebitî, lê karê wî sekinî. Piştre difikre ku li ser rêya giştî tenûrekê çêbike. Ew fêrbûna nanê tenûrê ji bav û kalên xwe girtiye.

Cuma Xwest vê fêrbûnê ji xwe re bike weke sûd êdî bi destê xwe tenûra ji heriyê çêkir û dest bi çêkirina nanê tenûrê kir da ku ji xwe re bike debara jiyanê.

Tevî zehmetiyan û bûhabûna ard û textan herwiha zehmetiya sekinandina bi seatên dirêj li ber tenûrê, ew nafikire ku dev ji vî karî berde ji ber ku ew dibîne ku mîrasa bav û kalên wî ye.

**Bi kamîreya Ayşa Silêman**



Qereçox

## FERHENGA BIWÊJAN

**Xaçê wî di bin çengê wî de ye:**
- Tiştên xwe eşkere nake; dilê xwe ji ti kesî re venake; derdora xwe dixapîne. (Ji tirsa misilmanan berê mesîhiyan xaçên xwe di binê çengên xwe de vedişartin)

**Xist bin zimanê xwe:**
- Veşart; ji ti kesî re negot; eşkere nekir.

**Xwediyê fisê bi xwe dihesê:**
- Her kes bi kiryarên xwe dizane.

**Xwe nade dest:**
- Tiştên kirîn eşkere nake; dizane veşêre.

**LI SER XWARIN, VEXWARIN Û QELEWBÛNÊ**

**Aş e:**
- Xwere ye; weke aşê Kuşo xwarinê dihêre.

**Aşê Kuşo ye:**
- Bi heman wateyê.

**Aşê wî her tiştî dihêre:**
- Gelaşoyî ye; her tiştî dixwe; çi li ber bikeve dixwe.

**Bû kerafî/kir kerafî:**
- Êdî nayê xwarin.

**Destê xwarinê dirêj e:**
- Destê min digihiyê; ez dikarim xwe bigihînimê.
(Li ser sifreyê dema yek xwarinê nêzîkî yekî dike, yê din dibêje; destê xwarinê dirêj e)

**Ez dixwim li wî diguvire/digivire:**
- Ez dixwim ew qelew dibe; ez dixwim bi kêrî wî tê.

**Gepa helal di ber de naçe:**
- Het tim ji kîsî xelkê dixwe.

**Hê tama wê li ser zimanê min e:**
- Xwarineke pir xweş bû; nayê jibîrkirin. Ketiyê zikê xwe ye:
- Ji xwarinê pir hes dike; xwarinê pir dixwe.

**Kir çirik:**
- Xwarineke pir danî. (25)

**Mela xwarin dît Quran ji bîr kir:**
- Bi nefsa xwe nikare; dema birçî dibe her tiştî ji bîr dike.

**Mirov tiliyên xwe pê re dixwe:**
- Pir xweş çêdike; pir bitam çêdike.

**Noşîcan be:**
- Ji bo kesê tiştekî dixwe, yan vedixwe tê gotin.

**Pozpaqij e:**
- Xwarinê dineqîne; her xwarinê naxwe; ne gelaşoyî ye.
(Heywanên her avê venaxwin ji wan re jî tê gotin pozpaqij e)

**Şîrê teyran jê kêm bû:**
- Her tişt tê de hebû; bê kêmayî bû.

**Tama wê di bin zimanê min de ye:**
- Xwarineke pir xweş bû; nayê jibîrkirin.


Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Hunermendên Kurdistanî: Em bi çareserkirina pirsgirêka Kurd bawer in



Hunermendên Kurdistanî Hozan Rotînda û Hozan Dîno tekez kirin ku ew bawer in wê pêvajoya çareserkirina pirsgirêka Kurd bi encam bibe û gelên herêmê wê bi hev re jiyaneke azad bijîn.**R-3**

## Li ber çavê cîhanê xweza tê talankirin



Dewleta Tirk a dagirker bi salan e li Bakurê Kurdistanê xwezayê talan dike, bi taybet cihên ku herî zêde qirkirina xwezayê lê tê kirin, Şirnex e. Daristanên ku tên tunekirin ji aliyê cerdevanan ve tên birîn û li metrepolan tên firotin.**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1298 13-Tebax-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## 'Bi keda Şehîd, Rêbertî û Gerîlayan veger bi fermî dikeve nîqaşê'



Hevseroka Meclisa Gel a Wergeha Şehîd Rustem Cudî (Mexmûr) Filîz Budak da zanîn ku nameya Rêber Apo ji bo Mexmûr kêfxweşiyeke cuda ava kir û got, "Cihê Rêbertî ji me re diyar bike wê weke ku perçeyekî ji buhiştê hatiye veqetandin be."**R-2**

# DAXWAZA GELÊN SÛRIYÊ AŞTÎ Û DEMOKRASÎ YE

Endamê Desteya Serokatiya MSD'ê Hesen Mihemed Elî destnîşan kir ku bi hişmendiyeke tund û hişk Sûriyê nayê birêvebirin, gelên Sûriyê xwedî hêzeke mezin in û dikarin xwe bi rê ve bibin. Hesen Mihemed Elî diyar kir ku pêwîstiya gelên Sûriyê bi kongreyeke neteweyî heye û wiha got: "Daxwaza gelên Sûriyê bi giştî aştî û demokrasî ye."**R-4**



## Ji çiraxên hunera Kurdî



Hunermend Wehîd Murad, dengê kelepûra Kurdî ji Dêrikê ber bi cîhanê ve. Deng û tevgerên wî bûne pirek di navbera nifşan de ku bi wan re bîra bav û kalan radighîne.**R-7**

## Ibrahîm Şêxo: Li herêmên dagirkirî kiryarên dijmirovî berdewam in



Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Ibrahîm Şêxo diyar kir ku li herêmên dagirkirî yên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî binpêkirin û kiryarên dijmirovî berdewam dikin. Şêxo ragihand ku li wan herêman rojane welatiyên Kurd tên işkencekirin, revandin û kuştin.**R-5**


Konfransa Hesekê... Barê Rêveberiya Xweser girantir kir! — Dilyar Cizîrî R-4


15'ê Tebaxê û QSD — Farûk Sakik R-5


Çima civîna Parîsê nayê lidarxistin? — Zekî Bedran R-5


Bingeha jiyana bi hev re komun e — Rohat Bulut R-6


Pêşbirka Nivîskarên Pêşerojê — Kemal Necim R-7

# Bi şoreşê re rola jin di partiyên siyasî de diyarker bû

Jina pêşeng hebûna xwe di hemû beşên civakê de îsbat dike û birêve dibe. Bi taybet hebûna jin di nava partiyên siyasî de bi sîstema Rêveberiya Xweser re diyarker bû. Vê yekê jî jinên ku cihê xwe di nava partiyên siyasî de digrin, piştrast kirin.

**Navenda Nûçeyan**

Di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de jinan rol û misyona xwe di hemû warên jiyanê de ji siyaset û leşkerî bigre heyanî xebatên civakî bi pêşengtî cihê xwe digrin. Ev tê wê wateyê ku şopa Şoreşa Rojava xwe di nav hemû jinan de bi kok kiriye û berhemên wê jî em niha dibînin. Bi taybet di nava xebatên siyasî de ku berê pir kêm me dîtiye jinan pêşengtî tê de kiriye û xebatên siyasî li kêlek mêr da bû meşandin. Ev wêne di Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hate guhartin. Di hemû partiyên ku di Herêmê Rêveberiya Xweser de hatine avakirin de rola jin tê de diyarker tê dîtin. bê guman ev jî encama keda ku di Şoreşê ku ji aliyê jina Kurd û hemû pêkhateyan ve hatiye kirin, pêşketiye. Ji lewra me jî xwest em bale bikşînin ser rol û hebûna jin di nava partiyên siyasî yên li Bakur û Rojhilatê Sûriyê. Têkildarî vê mijarê ji Partiya Nûjen û Demokrat Heyfe Mehmûd her wiha ji Partiya Demokratî ya Pêşverû ya Kurdî li Sûriyê Mîdiye Eko ji rojnameya me re axivîn.



Heyfe Mehmûd



Mîdiye Eko

**‘Têkoşîna Tevgera Jina Azad mîraseya serkeftinên îro ye’**

Heyfe destnîşan kir ku têkoşîna Tevgera Jina Azad bingeha destkeftiyên ku îro hatine avakirine û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di serî de divê em balê bikşînin ser Şoreşa Rojava ku di warê pêşxistina jin de xwediyê rola sereke ye. Jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyê de, bi navê Şoreşê jin hat naskirin û jinê erk û berpirsyartiya vê şoreşê hilgirt ser xwe. Di destkeftiyên ku em niha dibînin de, gavên gelek mezin tê de jin avêtin. Her wiha rastiyeke Rojava hebû ku civakeke birêxistin kirî bû û jinê jî xwe tê de birêxistin kiribû û tevlîbûna wê ji civakê re diyarker bû. Bi taybet di civaka Kurd de hinek jin xwediyê rol û sekna serbixwe ye û di demên berê de me didît ku jina Kurd di hin aliyên siyasî de cihê xwe girtiye.

Divê em mîrasa ku Tevgera Jina Azad di gihandina asta jinê ji roja îro re ji bîr nekin. Bi sala ye ji bo jinan têkoşîneke pir bi heybet li hember hişmendiye civakê a mêr û li hember tundiyê birêve biriye. Di heman demê de sîstema ku hatiye avakirin ji hevserokatiyê bigre heyanî rêxistin û saziyên xweser hatine avakirin. Ji lewra Têkoşîna wan bingehek bû ku li ser ev şoreş û destkeftî hatin avakirin”.

**‘Sîstema Rêveberiya Xweser bandora xwe li hebûna jin di partiyên siyasî de jî kir’**

Heyfe bal kişand ser tevlîbûna jinan di nava partiyên siyasî de û wiha got: “Em Partiya Nûjen û demokart ji destpêka avabûna partiyê 1996’an ve heta roja îro yek ji xalên sereke doza jin bû, mafê jin û çawa jin bikaribe xwe di nava civakê de birêxistin bike. Di nava partiyê de hejmarek mezin ji jinên çalak, pêşeng û siyasetmedar di asta herî jor de cihê xwe digrin û aktîvin. Jin bi nêrîn û îradeya xwe di nava partiyê de nîqaş dike, proje avadike û xebatên siyasî dide meşandin.

Bi giştî em dibînin ku di hemû partiyên siyasî yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatine avakirin de rola pêşengtiya jinê di asta herî jor de ye. Îro jin dibe navenda birêvebirina siyasetê bi hundir û derve re. Ger em bixwazin hevrûkirinekê di navber beriya şoreşê û piştî şoreşê bikin, em ê bibînin ku guhartineke bingehîn di rewşa siyasî de hatiye çêkirin ku hebûneke sereke a jin tê dîtin. Bi taybet di hundir sîstema Rêveberiya Xweser de serkeftinên mezin jin bidest xistin, vê yekê jî bandora xwe li hebûna jin di nava partiyên siyasî de jî kir”.

**‘Zihniyeta ku berê jinê pê siyaset dikir ne li gor jina niha bû’**

Her wiha Mîdiye diyar kir ku jin ji demên kevin de cihê xwe di nava siyasetê de digrin lê ne bi vî awayî bû û got: “Hebûna jina Kurd di nava siyasetê de ne tiştekî nû ye ji salên 1957’an de û berê jî hebûn, lê ew jin bi kîjan hişmendiyê bi çi erkê tevlî xebatê dibû ew girîng bû. Ji ber serweriya zihniyeta zilam û danasîna siyasetê bi zilam, ev yek rola jin weke cewher ji holê radikir. Lê belê bi avabûna sîstema Rêveberiya Xweser re ev zihniyet, ev terzê jinê a li gor mêr bi temamî hate guhartin. Helbet ew yek jî ne sûcê jinê ye, zihniyeta mêr û civakê hêştibû ku jin wiha nêz xwe bibe û girîngiya xwe nas neke. Bêhtir jin di nava xebatê siyasetê de cihê xwe girt û bû navenda hemû xebatan. Em dibînin ku hin jin di nava Rêverberiya Xweser de hene, pêşengtiyê ji pêvajoya Sûriyê û herêmê re dikin, ev jî cihê çanaziyê ye. Divê jinên din jî li gorî wê cihê xwe di sazî, partî û xebatên ku didin meşandin de bigrin”.

Mîdiya di dawiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Jin bi hêza xwe dikare cihê xwe di her derê de bigire û dikare bêhtirî karekî bide meşandin. Ev yek jî ji xwezaya jinê tê. Jin him dikare bi karê mal re mijûl bibe û him jî dikare bi siyaset û xebatê din re mijûl bibe. Ji lewra erka li ser jinê ne hindike û barê wê hîn girantir dibe”.

# ‘Bi keda Şehîd, Rêbertî û Gerîlayan veger bi fermî dikeve nîqaşê’

**Zana Roj/Qamişlo**

**Hevseroka Meclisa Gel a Wargeha Şehîd Rustem Cudî (Mexmûr) Filîz Budak da zanîn ku nameya Rêber Apo ji bo Mexmûr kêfxweşiyeke cuda ava kir û got, “Cihê Rêbertî ji me re diyar bike wê weke ku perçeyekî ji buhiştê hatiye veqetandin be.”**

Rêber Abdullah Ocalan herî dawî ji bo gelê Wargeha Şehîd Rustem Cudî (Mexmûr) nameyek şand. Gelê Mexmûrê ku 31 sal in ji koçberiyê jiyan dikin, tîna dilê xwe bi nameya dîrokî a Rêbertî av dan. Ev name ne tenê weke nameyekê bû û hat xwendin, ji bo gelê Mexmûrê weke perspektîv, xurtkirina tîkoşînê û hêviya vegerê hate pêşwazîkirin. Têkildarî nameya ku Rêber Apo ji gelê Wargeha Rustem Cudî re şandiye, hevseroka Rêveberiya Meclisa Gel a Wargeha Rustem Cudî (Mexmûr) Filîz Budak ji rojnameya me re axivî.

**‘Nameya Rêber Apo hêviya vegera welat xurt kir’**

Filîz Budak wiha dest bi axaftina xwe kir: “Piştî dehê salan di vê pêvajoyê de yekemîn care ku Rêbertî bi dîmen bi nameyên xwe derdikeve pêşberî gel û em dengê wî dibihîsin. Helbet ev yek di nava gelê wargehê de coş û moraleke mezin da avakirin, bendewarî û hêviyên heyî geştir û bilindtir kir. Ji bo gelê Mexmûrî ev ket sala 3’yemîn çalakiyên nobetê yên ji bo azadiya fîzîkî a Rêber Apo dabûn destpêkirin, tên berdewamkirin. Têkoşîna gelê Mexmûrê a 31 salan hemû li ser bingeha avakirina welatekî azad, Rêbertiyekî azad û nasnameya Kurdê azad dihat kirin. Ji ber wê yekê ev name di demeke wiha de ji gelê wargehê re şandin, bû hêza têkoşîn bilindkirinê, moral bikindikirin û peymana xwe nûkirin bû. Coş û moreleke mezin da avakirin her wiha hêviyên serkeftinê, hêvyên vegera welat di me de xurt kir. Bi taybet di demeke wiha de ji bo Mexmûr wext veqetandin, rewşa Mexmûrê girtina dest, name û silav şandin, di gel de kêfxweşiyeke cuda da avakirin”.

**‘Rêbertî bi rewşa vegera penaberan de têkildar e’**

Filîz diyar kir ku bi vê nameyê re tê dîtin ku Rêbertî di rewşa vegera penaber de bi dewletê re eleqedar dibe û wiha pê de çû: “Rewşa penamberan Rêbertî bi xwe têkildar dibe, vegerekî çawa çê bibe, gel li wir jiyaneke çawa avakirin, daxwazên gel wê çi bin, li ser van bingehan Rêbertî bi dewletê re nîqaşa wan dide meşandin her wiha Hiquq û qanûnê wê dê çi be ev yek tê kirin. Dema em wiha difikirin gelê Mexmûrê ji bo me pir cuda ye, cihê ku em ê lê jiyan bikin weke erdnîgarî Rêbertî dibêje ez ê diyar bikim. Cihê Rêbertî ji me re diyar bike weke ku perçeyekî ji cennetê hatiye veqetandine. Dema hatiye ragihandin ku name ji Rêbertî hatiye weke ku coşa cejnê di wargehê de hate avakirin. Hemû gelê wargehê kom bûn û name hat xwendin û pêşwazîkirin”.

**‘Bi keda Şehîd, Rêbertî û Gerîlaya veger bi fermî dikeve nîqaşê’**

Filîz wiha berdewamî da axaftina xwe: “Di aliyê polîtîk û siyasî de girîngiya Mexmûr di têkoşînê de dide diyar kirin, Rêbertî dibêje “Stûna bingehîn ya têkoşîna me, di pêvajoya avakirina Aştî û Civaka Demokratîk de jî wê bibe xwediyê heman rol û misyona girîng”. Di vê têkoşînê de birêxistinbûna Mexmûr, dibistan, komîn, sazî û meclisên xwe avakirin ne hêsan e. Rûxmî ku du dewlet bi ser de diçin him Tirkiyê û him jî hikumeta Îraqê, lê dîsta jî sîstema xwe a rêveberiyê dane avakirin. Di çarçoveya vê nameyê de ev bi awayekî şênbertir û bi gotina Rêbertî derket holêm, helbet xwedî girîngiyeke cudatir e. Ev name di vê pêvajoyê de hestên ku em vegerin welat êdî nema weke xewn û xeyalekî be. Ew hest di gel de hêviya herî nêz a vegerê derdixîne pêş. bi taybet însanên ku derketine ji welat ew êşa ku dîtine her wiha zarok û ciwanên ku li vir gihîştine, hesreta vegera welat di dilê wan de zindî dike. Welatê ku di oxira wê de û ji bo azadiyê me têkoşîn kir, me bedel da, me 7-8 war guhartin. Îro bi kedar Şehîdan, Rêbertî û Gerlîlayên azadiyê ber bi serkeftinê ve diherike, her wiha veger bi awayekî fermî dikeve nîqaşê.”

**‘Di vê pêvajoyê de erka gelê Kurd girantir e’**

Hevseroka Rêveberiya Meclisa Gel a Wargeha Rustem Cudî (Mexmûr) Filîz Budak Filîz axaftina xwe wiha qedand: “Ji vê demê û pêve divê gelê Mexmûr hîn zêdetir xwebirêxistin bike, têkoşîna hevpar divê hîn zêdetir bilin bikin, ji ber banga Rêber Apo di vê çarçoveyê de ye. Ev Banga “Aştî û Civaka Demokratîk” e, em ê vê civakê çawa demokratî bikin û aştî wê çawa pêk were, di asta giştî de rola gelê Kurd e. Gelê Kurd wê çawa vê pêvajoyê bi gelên cîran re lihevbike, bi netewên heyî re lihevbike ku her kes bi çand, ziman, nasname, ol û baweriya xwe jiyan bike û liberamber hev du rêz bigire. Li ser wî esasî em bikaribin vê rêxistinbûyîna xwe berdewam bikin û di çarçoveya Parêznameya Aştî û Civaka Demokratîk de xwe perwerde bikin û bikin rêbazê jiyana xwe, mirov bi vî awayî ancax pêvajoyê bibe serkeftinê. Di vê pêvajoyê de divê em rê nedin provakasyonê, rê nedin xêrnaxwazên ku naxwzin ev sîstem bi ser bikeve.”





# Ji çiraxên hunera Kurdî

**Can Yûsif**

Hunermend Wehîd Murad, dengê kelepûra Kurdî ji Dêrikê ber bi cîhanê ve.

Hunera Kurdî ne tenê vegotinek bedewîyê ye, lê ew vedenga êş û xemgîniya neteweyekê ye û neynika nasnameya wê di rûyê hewldanên jêbirin û piştguhkirinê ne.

Bi awaz û gotinan, hunermendên kurd bîrdanka gelê xwe parastin; stran veguhertin zimanekî berxwedanê û huner kirin çeperek ji bo parastina ziman û dîrokê, di dema ku çîrokên fermî bêbextî li wan kir bû, û bêdengiyê deng vedabû. Di vê rê de, navê Wehîd Murad wek yek ji dengên hilgirê xatîreya nasnameyê diçirisî, stranên wî ne tenê hunerekî xweşxuyî bûn, lê ew kiryarek çandî û berxwedanî bûn, ku di riya wan re ruhê gelê xwe dest nîşan kir û bi stranên xwe yên ku bi xweparêziyê zindî, tovê hişmendiyê di nav nifşan de çand, dengê xwe kire amûreke berxwedanê û ziman û muzîka kurdî kire mertalek di rûyê çewisandinê de. Stranên wî bûn sembolên pêdariyê û bîrdankek zindî di rûyê jibîrkirinê de .Hunermend û stranbêjê kurd Wehîd Murad di sala 1983’an de ji dê û bavek kurd (Ebdullah û Wasfiya) li gundê Girê Şêra yê gêrêdayî herêma Dêrika Rojavayê Kurdistanê, kaniya hunermend û rewşenbîran ,navenda çand û hunera kurdî, Keleha leheng û şoreşgeran, ew di nav malbatek kurdperwer a neteweyî ya xizan û evîndarê azadiyê de ku ji pênc zarokan pêk tê (sê xort û du keç) mezen bûye. Wî xwendina dibistana seretayî li gundê Til Xenzîr (Girê Şêra) û ya navîn li bajarê Dîrêkê xwend, lê nekarî perwerdehiya xwe bidomîne, ji ber kêşeya aborî û rewşên dijwar ên jiyanê ku malbata wî tê re derbas dibû, bi taybetî jî piştî wendakirina bavê xwe, ku wê gavê hîn temenê wî pênc sal derbas nekir bû. Hewes û evîna wî ya ji bo stran û muzîka kurdî di temenekî ciwan de dest pê kir, dema ku ew hêj xwendekarê qonaxa navîn bû, di bin bandora şêwaz û dengên hunermendên Kurd mîna Mihemed Teyîb Tahir û Eyaz Yûsif de, ku di wijdana wî de şopeke berbiçav hiştin, destpêka wî ya yekemîn di riya beşdariya wî di komên hunerî yên kurdî de ku bi vejînkirina şahiyên Newrozan radibûn, van beşdariyan, gavên wî yên yekem li ser riya hunerê pêk anîn.

Di sala 2001’an de, bi hevkariya hevalê xwe û kurê gundê xwe, hunermend Mustafa Hesen, koma “Dîcle” damezrand, ku bi vejînkirina konserên stranbêjiyê û dawetên gelêrî li herêma Cizîrê radibû, da ku bibe dengê şahî û neynika mîrasa Kurdî di xuyangiya xwe ya stranbêjiya resen de. Di sala 2001’an, koma “Dîcle” yekem albûma xwe ya stranan weşand, ku di nav de komek stranên ku tê de şêweyên folklorî yên kevnar û hestên nûjen bi hev re hevpar bûn, hebûn, û gotinên helbestvanê nemir Lorî Tildarî jî di nav de bi hêz dihat xuyang kirin.

Ji stranên herî navdar di vê albûmê de :

1- Çavê Reş Me Kilda

2- Bilbilo Hejaro

Bandora van herdû stranan gelekî di nav gelê kurd de hebû. Piştî 2003’an, wî hilbijart ku riya xwe ya hunerî bi rengekî taybet bişopîne û wî komek bi navê xwe damezrand, da ku ew rêwîtiya xwe ya hunerî bi şêwazê xwe yê cuda berdewam bike.

Roleke girîng ya Lorî Tildarî di piştgiriya wî de hebû, wî gelek stranên folklorî yên giranbuha diyarî bo wî kirin, di nav wan de, strana “Huplerî” bû nîşaneke cuda di rêwîtiya wî de, evê stranê dengdanek berfireh veda û heta îro jî di bîra gel de dimîne. Piştî du sala ji destpêkirina wî di koma Dîcle de, helbestvanê nemir merî Lorî Tildarî gurzekî nû ya stranan ji gotin û awazên xwe pêşkêşî wî kir, bi baweriya wî bi hinêra wî û bi rûmeta dengê wî ku ruhê axê di xwe de hildigire, ji nava wan stranan:

1-kerwanê Evîndara

2- Em hatin xwazgînî

3-Kaniyê Me çikane

4- Nakim nakim

5-Ma kanî tu kanî

Evan stranan şehla folklorê û germiya hest û hisa kurdî bi xwe re hildigirtin .Ew niha li ser vegerandina wan stranan dixebite, bi rêya tomarkirin û nûkirina wan di nav albûmekê yekgirtî de û were diyarkirin bo giyanê helbestvanê nemir Lorî Tildarî wekî nîşanê wefedariyê ji bîranîna wî re û spasnameyek ji keda wî re.

Hunermend Wehîd Murad di nav devereke ku bi kovan û hestên kurdî tije bû, hate dinyayê, li wir, stran ne tenê wekî amûrê kêfxweşiyê bû, lê mîna arşîvekî zindî bû ji bîra gelekî, ku êş û rewşa gundan, çîrokên dayikan û çîroka neteweyekê ku ji mafê xwe bêpar maye ku derbirîna xwe bi zimanê xwe bike. Ji destpêka gavên xwe di riya hunerê re, Wehîd Murad nas kir ku deng ne tenê amûreke ji bo hestên mûzikê, lê ew pêbaweriyek welatparêziye û peyamek neteweyî ye divê ji bo parastina wijdana mirovan were parastin. Dema ku peyva kurdî wekî serhildanekî tê hesibandin, an jî di hin cihan de wekî sûcekî tê rêzkirin, Wehîd hilbijart ku bi wê bistirîne, ew qet du dilî nebû, ji ber ku wî stranên kurdî tenê wekî awazekê ku kêfxweşî bide nedît, lê wekî peyamekê hebûnê, banga gelekî dît, ku hewl dida dengê xwe yê wenda ji nû ve bigire dest, di rûyê siyasetên jêbirinê û zordestiyê de. Wî ji bo mîrasê stran got da ku ji bîr nebê, ji bo azadîyê da ku were zayîn, û ji bo welatê ku di bîrdank û ziman de dimîne, ne di nexşe û sînoran de .Rola Wehîd Murad tenê bi stranbêjiyê re sînordar nema, lê ew bû parêzvanekî rastîn yê folklora kurdî bi hemû şêwazên wê ve, wî hewl da ku govend û stranên gelêrî yên ku ji serdema berê ve ku nifşan bi devikî ji dest hev digirtin vejîne û ji nû ve stranên kevin ên ku nêzikî ji bîrçûnê bûne zindî bike, wî ji devên kalemêran parçeyên hêja yên ji bîranîna stranbêjê berhev kirin, ji nû ve sererastkirin û bi şêwazekî nû ku zindî bimîne pêşkêşkirin; bi vê karî, ew bû pirek di navbera nifşan, ku mîrasa bav û kalan digihîne torînan, bi zimanê evîn û melodiyekî ku qet nayê qut kirin. Hunermend Wehîd di sala 2007’an de zewicî û ew bavê çar zaroka ye (sê law û keçek). Di sala 2010’an de jî, Wehîd albûmekî stran weşand ku di nav de komek stranên Şêxanî hebûn ku bi dengê xwe wî zêdeyek taybetî da vê rengê folklorê gelêrî.

Bi destpêka şoreşa Rojava û êrîşên ku piştî wê ji hêla komên çete ve li ser herêmên Rojavayê Kurdistanê hatin kirin, herêm veguherî wargehek bi ewleh ji bo giropên terorîst û hêzên tarî, êdî li wir tevlîhevî, nebûna ewlehî û aramiyê destpêkir, Wehîd Murad neçar ma ku bi malbata xwe ve di sala 2013’an, ku bajarê xwe bihêle û berê xwe bide herêma Kurdistanê, li wir jî, wî çalakiyên hunerî berdewam kir, gelek dewat û konser lidarxist û bi vî awayî, tevî zehmetiyên dûrketin û belavbûnê jî, wî hebûna xwe di qada stranbêjiyê de parast û rêwîtiya xwe ya hunerî domand.

Piştî salên xerîbiyê, hunermend Wehîd vegeriya bajarê xwe “Dêrik”, yê ku jê hezdikir û her gav di stranên xwe de li ser bedewiya wê distirand, lê şahiya wî dirêj nekir; guriya agirê şer derfet neda wî li wir bimîne û pêtên wê ewlehî û aramiya heyî dadqurtand. Bi kesereke kûr a ku ji kûrahiyên dilê wî derketiye, bi çavên ku xwînê dibarînê û bi dilê ku ji êşan tê givaştin, Wehîd Murad careke din ji Rojava xatir xwest û di Tîrmeha 2013’an de ber bi Ewropa ve çû. Tevî malbata xwe li Danîmarka bi cih bû, tevî dijwariya xerîbiyê û dûrbûna ji xwedan û welat, lê birînan ew ji dengê wî ne daxist, ne dûriya erdnîgariyê û ne jî xemên di dil de, nikarîbûn wî dûr bikin ji evîna wî ya bi hunerê re. Herwiha kariyera xwe li wir domand, vejîna û li welatên cuda yên Ewropa yê beşdarî dewat û konsertan bû. Ji ber pirbûna dawatan û dijwariya veguheztinê hunermend Wehîd di sala 2018’an de vegeriya Almanya, da ku nêzî welatên Ewropayê be û tevgera xwe hêsantir bike û bikare hebûna xwe ya hunerî bidomîne di nav revendên kurdî de.

Di sala 2021’an de, hunermend Wahîd albûmeke taybet ku ji pênc stranên Koçerî yên ji folklora kurdî ve hatibûn hilbijartin weşand:

1- De bêje

2- Nava Sengê Te

3-Gula Zer

4- Ji teviya zê te mo

5- Huplerî

Herwiha di albûmê de jî stranek taybet ji awaz û gotinên hunermend Nûhad Yûsif hebû, bi navê “Nava Sengê Te”. Di sala 2024’an de, wî stranekî bihîstbar ji awaz û gotinên hunermend Şivan Cizirî tomarkir bi navê “Toba nakim”. Niha, hunermend Wehîd dixebite li ser weşandina gelek klîpên stranên ku ji gotin û awazên hunermendê nemir Şevger Mîrza, di nav de:



1-Yara min çav beleke

2-Hat nîva govendê

3-Dewer govendê

Herwiha jî albûmek nû amade dike ku ji pênc stranên Bajarî pêk tê, ew jî ji gotin û awazên hunermendê nemir Şevger Mîrza ne :

1-Hey wey lê

2-Bawer bike

3-Bela xwe ji min veke

4-Tu dînî

5-Evîna te gelek zore.

Ev tev niha li Hewlêrê tên tomarkirin û dê di yek klîpê de tev werin bi cih kirin.

Hunermendê kurd Wehîd Murad yek ji navdartirîn hunermendên ku ji bajarê Dêrika Rojavayê Kurdistanê ye û tê zanîn bi tevlîbûna xwe ya ji gelek konsertan û şahiyên kurdî, bi taybetî li Ewropa. Ew hunermendekî kurdî yê hevdem e ku bi şêwazên xwe yên zindî di govendên gelêrî yên kurdî de wek “Şêxanî”, “Du gavî” û “Koçerî” xwe nîşan derketiye pêş; vê yekê hiştiye ku hezkirin û dengvedaneke wî ya berfireh di nav revenda Kurdî de çêbibe. Wehîd Murad bû sembolek ji nîşanên folklora kurdî, ne tenê di hundirê welat de, lê her wiha di nav revendên kurdî ên belavbûyî li cîhanê jî.

“Nav û dengê Wehîd Murad tenê bi herêma Rojavayê Kurdistanê ve sînordar nema, lê ew gihişte tevahî Ewrûpayê jî. Ji ber wê yekê ew tê hesibandin wekî yek ji kesayetên navdar ên hunerê di dawetên kurdî de, li ewropa ew beşdarî gelek konser, festîval û dawetên kurdî yên ku di piraniya welatên Ewrûpayê de tên lidarxistin dibe.

Deng wî, tevgerên wî bûne pirek di navbera nifşan de ku bi wan re bîra bav û kalan radighîne. Bi karên xwe, Wehîd Mûrad bûye sembolek çanda gelêrî nemaze di çavê ciwanên kurd de yên ku di nav tora guhertinên siyasî û civakî de li nasnameya xwe digerin. Şêwaza wî di pêşkêşkirina hunera kurdî de ew nêzîkî dilên mirovan dike û bûye neynika rastîn ku ruhê civaka kurdî nîşan dide. Hunermend Wehîd Murad ne tenê stranbêjek yê hunera gelêrî ye, lê belê ew balyozê çanda kurdî ye ku barê wê daniyê li ser milê xwe di her bûneyê de, bi lêdana defê, bi zingila dengê xwe û bi govenda pêkan, çîroka gelê xwe vedibêje, çîroka kêfxweşî û êşê, hêvî û berxwedanê.

Bi pabendbûna wî bi mîras ve û beşdariya wî ji bo parastina wê, navê wî hêja ye ku bikeve di nav lîsteya wan kesên ku bi dilsozî û afrînerî xizmeta çanda kurdî kirine.

Ez ji wî re serkeftin, afirîner û geşedanê di rêwîtiya wî ya hunerî de dixwazim

## Têbînî



**Pêşbirka Nivîskarên Pêşerojê**

Kemal Necim

Me berê di vê quncikniviîsê de behsa wêjeya ji bo zarokan kiribû, ango wêjeya ku ji bo zarokan tê nivîsandin û afrandin. Ji xwe ew cureyê wêjeyê ne zarok dinivîsin, lê mezinên pispor dinivîsin.

Lê gelo zarok jî dikarin wêjeyê binivîsin an jî nivîsîna afrênerî bikin, eger dikarin çi girîngiya wê ji bo zarokan heye? Li gorî gelek çavkanî û ezmûnan, fêrkirina nivîsandina wêjeyê ji bo zarokan dibe alîkar ji bo pêşxistina jêhatî û behremendiyên wan ên ziman û zanînê. Herwiha karîna wan a afrînerî û derbirînê bihêz dike û dibe egera çasipandina nirxên exlaqî û berfirehkirina asoyên wan ên zanînê.

Di hêla ziman de afrandin û nivîsandina deqên wêjeyî, yên ji celebên cûrbecûr, dibin alîkar ku ferhenga zarokan a ziman dewlemend bibe, pergal û avahiyên zimanî yên nû fêr bibin û karîna wan a afrênerî, derbirîn û rewanbêjiyê zêde dike.

Herwiha ji hêla raman û hişmendiyê ve jî nivîsandina wêjeyî dibe egera pêşxistina raman û hişê rexnegir û jêhatîbûnên zarokan ên çareserkirina pirsgirêkan pêş dixe û alîkariya zarokan dike ku raman û hestên xwe bi awayekî afirîner û rêkûpêk derbirînin. Ji xwe nivîsandin û derbirîn rê li ber zarokan vedike ku xwestekên xwe yên zanebûnê têr bikin û asoyên fireh ji bo zarokan vedike û wan bi çand û cîhanên nû dide nasîn û hewesa wan a ji bo fêrbûnê zêde dike.

Bi rêya nivîsandina çîrok û berhemên wêjeyî, zarok nirxên girîng ên wekî hevkarî, rêzgirtin, rastgoyî, berpirsiyarî û têkiliya bi kesên din re fêr dibin. Ji aliyekî din ve jî nivîsandin li ba zarokan hestên serkeftinê pêş dixe û dihêle ku baweriya wan bi kesayeta wan xurtir bibe. Aliyekî din ê pir girîng jî ku nivîsandina wêjeyê deriyê xeyala berhemdar li ber zarokan vedike, zarokan têvedide ku ramanên nû û nûjen biafirînin, û karîna xwe ya ramana afirîner zêde bikin.

Di vê derbarê de mirov dikare behsa çalakiyeke girîng a ji bo pêşxistina afrêneriya wêjeyê ya zarokan bike, ew jî pêşbirka bi navê Nivîskarê Pêşerojê ye ku ji sala 2020`an ve ji hêla Desteya Çanê ya Kantona Cizîrê û Dîwana Wêjeyê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ve tê lidarxistin. Her çiqas ev çalakî girîng û bi wate ye jî, lê awayê pêkanîna wê ji gelek hêlan ve qels û lawaz e. Pêşbirk li ser 3 pêvajoyan tê lidarxistin, destpêkê zarok ji xwe re pirtûkekê (çîrok-hlbest) hildibirêjin û dixwînin, paşê tişta jê fêm kirine ji komîteya nirxandinê re vedibêjin. Di qonax duyem zaroka kurtiya naveroka çîrokê dinivîsin, di qonaxa sêyem de ji zarokan tê xwestin ku ji xeyala xwe çîrokekê binivîsin.

Lê piraniya wan zarokan cara pêşî ye ku ji wan tê xwestin berhemekê ji xeyala xwe binivîsin, ew bi ti awayî şêwe û rêgez û hêmanên nivîsînê fêr nebûne. Lewma ev pêşbirk qels û lawaz dimîne.

Divê hin gavên din bêne avêtin, yek ji wan ku berî zarok pirtûkekê hilbijêrin û bixwînin, wan têxin kors û komxebatên sivik û kurt. Di wan komxebatan de zarok fêrî hêmanên sereke yên nivîsîna wêjeyî bibin, paşê ji wa were xwestin ku bixwînin û binivîsin.

# ‘Helwestên pîroz û bangên dîrokî ji Konferansa Pêkhateyan derketin’

**Rêveberê Komîteya Lihevkirinê ya Meclisa Edaletê ya Kantona Cizîrê Nûredîn Şakir da zanîn ku helwestên pîroz û bangên ji bo nenavendîbûna Sûriyê ji Konferansê Pêkhateyan derketin û got, “Bêyî Rêveberiya Xweser û QSD'ê aloziya Sûriyê çareser nabe.”**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Konferansa Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi beşdariya pêkhateyên Kurd, Ereb, Suryanî, ermenî, Tirkman û Çerkez herwiha nûnerên QSD, Tevgera Civaka Demokratîk, rêxistinên jinan, partiyên siyasî û hwd… amade bûn. Girîngiya vê konferans di demeke wiha de ji hêla hemû gelên Sûriyê ve bi erênîn hat nirxandin. Herwiha hêviya gelên Sûriyê ku encamên vê konferansê li ser rûyê erdê pêk were, destûrekî hevbeş û demokratîk were sazkirin da ku pirsgirêka Sûriyê çareser bibe. Derbarê heman mijarê rêveberê Komîteya Lihevkirinê ya Meclisa Edaletê ya Kantona Cizîrê Nûredîn Şakir ji rojnamaye me re axivî.

**‘Helwestên pîroz û bangên dîrokî ji Konferansa Pêkhateyan derketin’**

Nûredîn Şakir destnîşan kir ku helwestên pîroz û bangên dîrokî ji konferansê derketin û wiha domand: “Konferansa Pêkhateyan li ser esasê pêkanîna hevgirtin, yekîtiya gelan û yekhelwestbûna pêkhateyên Sûriyê hat lidarxistin. Di heman demê de konferans nameyeke hişyariyê bû ji hikumeta veguhêz a Şamê re, ji ber ev hikumet pêkhateyên Sûriyê paşguh kirine û tenê li ser sîstemeke yekalî dimeşe. Heya niha jî xebata hikumeta Şamê bi awayekî yekalî û yeksiyaset daye meşandin, wê destûreke tekane ava kir û dixwaze parlemanekî taybet ji bo xwe bide avakirin. Em dibînin ku ew mîna rêjîma Baas tevdigere, ew hatiye li serdesthilatdariya wê ji bo meşandina zihniyet û xebata Baas. Hikumeta veguhêz tevahiya pêkhateyan hembêz nekiriye, lê belê komkujî di derheqê wan de pêk aniye. Di roja îro de jî hewldanên hikumeta Şamê û derdora wî dixwazin tevlîheviyê di navbera pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ava bikin. Lê di konferansê de hevgirtin, helwestên pîroz û bangên ji bo avakirina Sûriyeke nenavendî ji hêla hemû pêkhateyan ve hatin nîşandan.”

**‘Bêyî QSD’ê û Rêveberiya Xweser aloziya Sûriyê nayê çareserkirin’**

Şakir tekez kir ku bêyî Rêveberiya Xweser û QSD’ê pirsgirêka Sûriyê çareser nabe û wiha got: “Niha sîstemeke demokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyê li dare, bi saya QSD’ê ya ku nûnertiya hemû pêkhateyên herêmê dike, Rêveberiya Xweser tê parastin. Dewleta Tirk bi hemû rêbazan dixwaze li dijî Rêveberiya Xweser derkeve û QSD’ê bêçek bike. Sedem ew e ku gelê Kurd pêşengitiya sîstema demokratîk dikin, dewleta Tirk jî Kurdan weke dijmin ji xwe re dibîne. Dewleta Tirk xwe dike waliyek li Sûriyê, lê em dizanin ku dagirkeriya Tirk ti caran başiyê ji gelên Sûriyê re naxwaze. Dema ku dewleta Tirk xwe weke waliyekî bihesibîne, dê tiştekî xeternak be ji bo Sûriyê. Di dema rêjîma Baas de Îran waliyek bû ji bo Sûryê, em naxwazin Sûriyê ji desthilatdariya Îranê ber bi hegemoniya Tirkiyê ve biçe. Ji ber wê gelên Sûriyê rastî krîzên mezin werin. Riya çareseriyê li gel pêkanîna projeya Rêveberiya Xweser e û bêyî QSD’ê pirsgirêka Sûriyê çareser nabe. Di Konferansa Pêkhateyan de jî hemû pêkhate piştgiriya xwe ji bo QSD’ê dan tekezkirin.”

**‘Gelên Sûriyê hewcedarî destûrekî demokratîk in’**

Rêveberê Komîteya Lihevkirinê ya Meclisa Edaletê ya kantona Cizîrê Nûredîn Şakir anî ziman ku pêwîstiya Sûriyê bi hevpeymaneke civakî heye û wiha axivî: “Daxwaza pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê û tevahiya gelên Sûriyê di konferansê de ew bû ku destûreke demokratîk û pirreng were sazkirin ku wan hembêz bike û mafê wan biparêze. Da ku gelên Sûriyê ji



komkujiyan, şerê navxweyî û aloziyan were parastin, pêwîst e destûrekî nû yê demokuratîk were sazkirin. Hevpeymana Civakî û ya li ser hîmê Neteweya Demokratîk nimûneya serkeftî ye ji bo siberoja Sûriyê û encex krîza Sûriyê bi sîstemeke wiha were çareserkirin. Ne tenê pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê sîstema Rêveberiya Xweser ji bo xwe pejirandine, lê belê hemû pêkhateyên Sûriyê ev proje weke riya çareseriyê qebûl kirine. Tevahiya gelên Sûriyê nema rewş û siyaseta beriya sala 2011’ê li ser xwe qebûl dikin. Lewma jî di Konferansa Pêkhateyan de careke din projeya Rêveberiya Xweser a li ser bingeha jiyana hevbeş weke modêleke nûjen a siberoja Sûriyeke demokrat hate hilbijartin. Bila her kes bizanibe sîstema ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê îroj tê meşandin, tenê dikare tevahiya gelên Sûriyê ji şikefta tarî ya ku hikumeta Şamê daye avakirin, derxîne.”

# Li ber çavê cîhanê xweza tê talankirin

**Amara Baran/Qamişlo**


**Dewleta Tirk a dagirker bi salan e li Bakurê Kurdistanê xwezayê talan dike, bi taybet cihên ku herî zêde qirkirina xwezayê lê tê kirin, Şirnex e. Daristanên ku tên tunekirin ji aliyê cerdevanan ve tên birîn û li metrepolan tên firotin.**

Dewleta Tirk ku bi salane xwezaya Kurdistanê bi hemû şêwazan tune dike, li milekî li ser axa Kurdistanê qereqolan çêdike, li milê din jî daristanan dişewitîne, niha jî li herema Botanê darên Kurdistanê qut dike û li metrepolan difroşe.

Derbarê qirkirina xwezaya Kurdistanê de, endamê Platforma Ekolojî ya Şirnexê Ehmed Başak ji rojnameya me re axivî.

**‘Aşitî bi talana xwezayê pêk nayê’**

Ehmed Başak di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Piştî banga Rêber Apo ku di 27’ê Sibatê de ji bo aşitî û civaka demokratîk kir, li Rojhilata Navîn û di nav gelê Kurd û Kurdistanê de hêviyeke mezin afirand. Bi destpêkirina pêvajoya aşitiyê re dewleta Tirk li Kurdistanê bi taybet li herêma Botanê dest bi qirkirin û talankirina xwezayê kir. Dewleta Tirk di salên 90’î de di bin navê ewlehiyê de daristan dişewitandin, îro jî bi heman kiryarê waliyê Şirnexê îhalê didin cerdevanan û xwezayê talan dikin. Darên ku tên qutkirin li metrepolan têne firotin.”



**‘Bi talankirina xwezayê jiyana zindiyan di xeteriyê de ye’**

Ehmed diyrkir ku bi talankirina xwezayê re jiyana hemû zindiyan dikeve xeteriyê de û wiha anî ziman: “Ev hefteyeke ku platforma ekolojî ya Şirnexê dest bi standa komkirina îmzeyan kiriye ku hişmendiyekî di serê gelê xwe de bidin avakirin, ku edî berteka civakê li hemberê cerdevanan derbikeve. Ruxmê ku gelek çalakî hatine lidarxitin û heyetên ku ji Ewrûpa hatibûn rapor ji bo wan hat ragihandin jî, lê heta niha tu bersivek nehatiye dayîn.”

**‘Dewleta Tirk buhişta Kurdistanê dike dojeh’**

Ehmed balkişand li ser talana ku li herema Gabarê pêk tê û wiha got: “Li çiyayê Gabarê jî heman kiryar tên domandin, di bin navê komirê de xweza hatiye talankirin, gel nikare derbasî gundên xwe bibe, nêzîkî 400 km rê birine çiyayê Gabarê û bi hemû şêwazan xweza tê talankirin. Ger dibêjin aşitî lazime, aşitî di pratîkê de pêk bînin. Dewleta Tirk di kiryarên xwe de hîla dike ger bixwaze aşitiyê pêk bîne lazime dev ji kiryarên xwe berde, aşitî bi talana xwezayî ne pêkane. Bi salane gel tekoşînek bê hempa da meşandin lê îro dewleta Tirk û cerdevan bax, baxçe û rezên gel talan dike.”

**‘Tenê rêjeya kuştin û birîndaran tê dayîn kes behsa talana xwezayê nake’**

Ehmed da zanîn ku armanca dewleta Tirk talana xweza û qutkirina dara ye û wiha pê da çû: “Di pêvajoyên şer de jî, ji aliyên dewletan ve tenê rêjeya têkçûna aborî û rêjeya kuştin û birîndaran tê dayîn, heta niha tu dewlet talankirina xwezayê nabînin. Kurdistan ji aliyê dewletê ve bûye weke çolistaneke zuha. Li gor rejeyên ku beriya çar salan ketine destê me de, ji sedî 44 ji axa Kurdistanê daristanbûn, di nav 7 mehan de li gorî biroya Şirnexê ji sedî 8 daristan hatine talankirin. Ji ber ku waliyê Şirnexê 15 rojan carek qedexeya derketinê dide raberkirin, ji ber wî jî em nikarin biçin rêjeya darên ku hatine birîn derbixin. Rojê 50 qamyon darên ku hatine qutkirin derbasî metrepolan dikin, li ser medya civakî rûpel hatine vekirin bazirganiya darên Kurdistanê dikin. Heta niha kes nikare biçe ku çiqas zirar gihaştiye heremê. Ruxmê ku çend dosya hatin vekirin jî hemû bê bersiv man.”

Hêjayê bibîrxistinê ye ku herêma Botanê yek ji wan herêmên ku bênavber dar lê tên birîn û heta niha li 82 qadan daristan hatine hedefgirtin.

Qadên ku daristanên wê hatine hedefgirtin wiha ne:

**Herêma Cûdî**

Avgamasya, Divîn, Dûvyan, Şilerût, Cifana, Akît, Gundikê Sipîndaro, Gundikê Remo, Gilindûr, Nêvava, Bilga, Girê Çolya, Şaxahevler, Hesana, Sorbitna, Bêşêrê, Bawîte ,Bestabeleka, Gawîte, Gite, Bêstin, Cilbiya.

**Herêma Gabarê**


Navyana Şêxan, Turkiz, Deştika Osu, Xarê Bizo, Xuhdan, Mendikera, Dihok, Kendalya, Giver, Banê botyanê, Gurdila, Bêsûke, Nanîv, Cinêt, Berkever, Bîrava, Zivingo, Qernê Êrê, Dêrşew, Sipîvyan, Deştalela, Berêmirê, Harûnreşit, Basret, Ewîna, Bênata, Çiyayê Bizina, Meydîn, Şerefiyê, Bertû, Darayê, Geliyêbinefş, Şiyan.

**Herêma Besta**

Bîşyêreş, Beraza, Girêxarso, Gihiştî, Bêmga, Berêbiya, Bestakanîferşkê, Besta bêloze, Çemêqizil, Rêriya bagere, Deşta, Misila, Baniyê Umer axa, Kûrtetoze, Xaşîxanê, Girêgêsin, Avtehlgê

Warê biye, Mêrgomarê, Xerbgê Bestê, Cinîwer, Işte Reşa, Xarê kona, Şehrevan, Keniya Mîr, Zirvîn, Çemê mezin

**Xwenasîn**



## Bingeha jiyana bi hev re komun e

**Rohat Bulut**

Îro, pevçûn, polarîzasyon, newekheviyên aborî û cudakariyên li ser bingeha nasnameyê yên li seranserê cîhan û bi taybetî jî li erdnîgaiya me ya Rojhilata Navîn ber bi pirsgirêkên dilsoj ên ku ji her demê girîngtir ve dibin. Di rewşeke wiha de em wekî mirov û civak jiyaneke çawa hêvî dikin, dixwazin û ji bo wê têdikoşin? Bersiv, dibe ku di forma xwe ya herî hêsan de, ev e: Jiyanek li ser bingeha komunalîteyê bi hev re, wekhev, azad û bi rûmet. Ji bo wê jî heke em bi mijara xwe ve dakevin dê encameke çawa derê pêşiya me?

Belê jiyana komun û wekhev ne tenê parvekirina hevpar a kelûpelan e, lê belê wijdanek hevpar, berpirsiyariyek hevpar û vîzyonek hevpar a pêşerojê ye. Ew şêwazek jiyanê ye ku tu kes nayê dûrxistin û her kes dikare xwe îfade bike û her kes piştgiriyê dide hev. Ew mirovan dixe navendê, mirovan wekî tevahî qebûl dike, ne tenê xerîdar an hilberîner.

Fonksiyona herî di cih de û saxlem a jiyana civakî bi belavbûna vê giyanê komunî ve girêdayî ye. Lewre di civakbûyîna rastîn de ne “ez”, “em” hene. Ev pîvana sereke ya bi hev re jiyanê ye û bi vê pîvanê civakbûyîn pêkan e. Li ser heman axê û erdnîgariyê jiyîn, nabe pênaseya civakbûyînê. Ji bo jiyana bi hev re pêwîstî bi nirxên hevpar heye. Ew nirx jiyan û civakbûyînê diyar dike. Lewma jî mirov dikare behsa nirxên civakî yên jiyana bi hev re bike ku bigihêje wateya xwe. Ev jî bi rêya “jiyana demokratîk” mimkun e.

Demokrasî ne tenê dengdana li ser sindoqên dengdanê ye. Demokrasî toreke têkiliyan e ku divê her roj ji nû ve were avakirin. Ew şêwazek jiyanê ye ku li malê, li kar, li kolanan, jin û mêr, hemû netew, bawermend û bêbawer, ciwan û pîr, dikarin bi wekhevî biaxivin û guhdarî bikin û bijîn. Yanî şêwazê jiyanê ye û ev şêwaza jiyanê bi azadiyê wate digire. Azadî ne tenê azadiya ji bindestiyê ye; ew qada pêkanîna potansiyela mirov e. Bê tirs axaftin, jiyana li gorî pîvanên civakî û etîkî jiyîn, hebûna bi nasnameya xwe û hwd. pîvanên rastîn ê jiyana civakekê ye. Lê bêyî aştiyê tiştek ji van ne mimkun e. Aştî ne tenê bêdengkirina çekan e, aştî axaftina bi wêrek a ji dil e. Aştiya rastîn bi avakirina edaletê mimkun e. Lê belê, edalet divê ne tenê li dadgehan, di her aliyê jiyana rojane de were hîskirin. Di nan de, di kar de, di gotinê de, di evîn û hezkirinê de divê edalet were hîskirin.

Ji ber vê yekê divê wekhevî ne tenê wekî li ser hebûna mafan were nirxandin. Divê li ser hemû şaneyên ku jiyanê dihafirîn in bê nirxandin û hesibandin. Lewre dibe ku her mirov ne li ser xeta destpêkê ya pêşbirkê be. Lê divê mafê her kesî hebe ku xwe bigihîne xewn û xeyalên xwe û ev xewn xewnek e ku mirov dikare bi hev re ava bikin. Dema ku gelên cuda, çand û zimanên cuda têne cem hev, rengîniyeke xweş û civakî derdikeve holê. Ev cihêrengî ne gef e, lê dewlemendiyek e. Tişta ku neteweyek an jî civakekê xurt dike, ew gihiştina hev a pirengiya civakê ya li ser bingeheke hemwalatîbûneke wekhev e.

Bi kurtasî, jiyana komunî ne utopya ye. Ew “pêdivî” ye ji bo her kesê ku banga xwezayê, dîrokê û mirovahiyê dibihîze. Ji ber ku ev cîhan a me hemûyan e û li vê cîhanê heke em dikaribin bi hev re bijîn, wê demê tê wateya rast a bi hev re jiyanê.



# Hunermendên Kurdistanî: Em bi çareserkirina pirsgirêka Kurd bawer in

**Hunermendên Kurdistanî Hozan Rotînda û Hozan Dîno tekez kirin ku ew bawer in wê pêvajoya çareserkirina pirsgirêka Kurd bi encam bibe û gelên herêmê wê bi hev re jiyaneke azad bijîn.**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Banga Aştî û Civaka Demokratîk a ku ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatiyekirin, li çar aliyê cîhanê deng veda. Ev bang muhra xwe li hemû pêvajoyê xist û piştgiriyeke navnetewî dît. Girêdayî banga dîrokî ya Rêber Apo hin hunermendên Kurd jî piştgiriya xwe ji pêvajoyê re ragihandin. Têkildarî vê yekê hunermendê Kurdistanî Hozan Rotînda û Hoza Dîno ji rojnameya me re axivîn.

**‘Banga Rêber Apo pêngaveke dîrokî di nav mirovahiyê de da destpêkirin’**

Hozan Rotînda di destpêka axaftina xwe de ev anî ziman: “Pêvajoya heyî bi banga Rêber Apo re dîrok guharand, ev yek jî ne tenê ji bo gelê Kurd û Kurdistanê, ji bo hemû gelên bindest, însanên xwedî wîjdan, însanên sosyalîst û demokrat bû. Banga Rêber Apo a 27’ê Sibatê pêngavekî dîrokî di nava mirovahiyê de da destpêkirin. Her wiha em hêvî dikin ku dewleta Tirk bersivekê rast bide û bikaribe êşa gelan bidawî bike, ji ber ev şerê ku 40 sal in tê kirin tenê êş kiriye para gelan.”

**‘Pêvajo wê bi hêsanî derbas nebe’**

Rotînda da zanîn ku di şopandina çapemeniya Tirkiyê de yek nêrîn tune ye û ew bi gumanin û wiha got: “Di parvekirina nêrîna xwe de, ez dikarim bêjim ku dema em çapemeniya Trikiyê û rayedarên dewletê dişopînin, em dikevin nava hin gumanan. Di dewleta Tirkiyê de yek nêrîn nîn e. Beşa herî bi tehlîke faşîstên kamalîst yên ku di CHP’ê de kom bûne ne, li gor me CHP’ê ew hêza sereke a ku li



Hozan Rotînda

pêşiya vê pêvajoyê dibe asteng. AKP’ê çawa ku ola îslamê bikar tîne, ew dikare li ser hemûyan bandor bike. Di destpêka vê cumhuriyetê de çawa ku di Peymana Severê de bingeha vê cumhuriyetê bi yekîtiya Kurd û Tirkan hatibû avakirin bi Lozanê re jî înkara Kurd hate kirin. Partiya Etaturk li pêşiya yekîtiya gelê Kurd û Tirk kelema herî mezin bû. Niha beşek ji dewletê dixwaze bersivekê erênî nîşan bide û aştiyekî mayênde di navebera gelê Kurd û Tirkiyê de va bibe, lê em bawerin ku ev pêvajo wê bi hêsanî derbas nebe û tayebt ji bo gelê Kurd divê têkoşîna xwe zêdetir xurt bikin.”

**‘Divê di çapemeniya Tikriyê de pêvajo di wateya wê a rast de bînin ziman’**

Rotînda di dewama axaftina xwe de wiha got: “Marasîma çek şewitandinê a Gerîlayên Azadiyê ku weke stêrkên esîmanan ji ciya dihatin xwar, ew di guhartina dîrokê de pêngavekî gelekî girînge û ji bo aştiya gelan bingehekî pir zelal ava kir. Çek şewitandin jî xwediyê wateyekê pir mezine weke wateya agirê Newrozê ye. Em bi hêvê dikin ku ev pêvajo bi serkeftî bimeşe, lê heya niha tişta ku ji aliyê Trikiyê ve tê dîtin weke ku dixwazin pêvajoyê dirêj bikin. Her wiha di zimanê çapemeniya wan de hîn tu guhartin nehatine çêkirin, hê jî qala terorîzmê dikin û terora herî mezin wan li ser gelê Kurd kiriye.





Hozan Dîno

Lê belê divê çapemeniya Tirkiyê pêvajoyê di wateya wê a rast de bîne ziman, da ku gel şiyar bike. Ya din diviyabû komisyonek ji destpêkê ve bihatiba avakirin, lê şeş meh serbas bûn û hîn ev yek pêk nehatiye û di nîqaşan de ye. Ya din divê destwerdan û êrişên xwe yên li ser Rojavayê Kurdistanê bide sekinandin, çima Rojava ewqas ji xwe re xeter dibîne? Ger vê derfetê ji xwe re birevînin em bawerin wê vê niyeta paqij, aştiyane ku pêşeroja gelan ronî dike a Rêber Apo wê bidestbixin.”

**‘Bi hêvî ne ev pêvajo biser bikeve û em bi Rêber Apo bawer im’**

Hozan Rotînda bi van gotinan axaftina xwe bidawî kir: “Ez wekî hemwelatiyekî Kurd û xebatkarê hunera Kurdî, ez dixwazim ev pêvajo bi aştiyekî mayînde, bi rûmet, bi yekîtiya gelê Kurd û Tirk û hemû ol, bawerî û pêkhateyên din bi ser bikeve. Em bikaribin bi hev re li ser wê axê bi aştî û azadî jiyan bikin. Her çiqasî ez weke kes baweriya min bi aliyê din nebe jî, lê ez bi felsefe, nêrîn û tişta ku Rêber Apo dibîne û bawer dike, bawer im û bê guman hemû gelê me jî wisa ye.”

**‘Çareserkirina pirsgirêka Kurd li her perçeyek Kurdistanê xwedî taybetmendiyek cuda ye’**

Hozan Dîno derbarê çareseriya pirsgirêka Kurd wiha dest bi axaftina xwe kir: “Çareserkirina pirsgirêka Kurd ji bo her çar perçeyên Kurdistanê girîng e, bê guman her perçeyek jî xwedî taybetmendiyeke cuda ye. Her perçeyek divê bi awayekî cuda bê çareserkirin. Lê belê weke ku em hemû dibînin li Rojavayê Kurdistanê bi rastî şerekî pir mezin hate kirin û serkeftinên mezin jî hatin bidestxistin û hîn jî bi rêya siyasî û leşşkerî ev berxwedan tê domandin. Pirsgirêka gelê Kurd pirsgirêkekî nû nîne, ji hezar salan ve dirêj dike, bi tayebt di 50’î salên dawiyê de şerekî gelek dijwar hat dayîn û hê jî berdewam e. Hêviyên me ji Rojava zêdetire ji ber di aliyê leşkerî de weke artêş û hişmendiya Kurdewarî zêdetir pêşketiye. Li Bakur zêdetir dejeneresyonek çêbûye, asîmîlasyonek gelek dijwar hat meşadinher çiqas ji perçeyên Kurdistanê yên din mezintir be jî, lê asîmîlasyonek jî di aliyê Kurdewariyê de hatiye kirin. Bi têkoşîna PKK’ê re her çiqas têkoşîn di vî alî de hate kirin jî, lê hinek zehmet bû û hê didome. Helbet ev yek nayê weteya ku hêvî û baweriya me nîne ji berev yek hinek girêdayî siyaset û mercên Rojhilata Navîn û herikandina şer e”.

**‘Pirsgirêka Kurd tenê bi rêûrêbazên demokratîk dikare çareser bibe’**

Hozan Dîno da zanîn ku “Bi rêya PKK’ê tê ceribandin ku Bakurê Kurdistanê dikarin bi awayekî demokratîk pirsgirêka Kurd çareser bikin, lê bi rastî dewleta Tirk dewletekî nijadperest e û ji bo çareseriya mijara Kurd hîn xwe amede nabîne. Ji ber bi dehan sal civaka xwe bi awayekî nijadperest perwerde kir û hîn bi xwe jî ne demokrate û ne amedeye. Lê di van demên dawiyê de xuyaye ku êdî Tirk jî têgihiştine ku pirsgirêkekî mezin di Rojhilata Navîn de diqewime û ihtîmale dewleta Tirk jî têk biçe. Ji ber van fikaran dixwazin bi awayekî vê yekê çareserbikin, lê naxwazin ku tiştekî, mafên bingehî bidin Kurdan. Hewil didin ku tiştekî nedin Kurdan û bi hêsanî vê demê derbas bikin. Bi rastî bexwedaniyek heye, bi tayebt gelê me yê Bakur û qehremanî li ber xwe da. Lê bivê nevê dewleta Tirk ne hêzekî ji rêzê ye û hêsan nîne, di 50’î saî de jî ne PKK’ê bi ser ket û ne jî Tirkiyê, lê wateya şer êdî nema. Bi vê awayî ihtîmal heye ku 50’î salên din jî şer bikin, lê ew nayê wateya k utu serkeftin bi dest bixî, min di jor de jî got ev hinek girêdayî şert û mercên Rojhilata Navîn e. Ger tiştekî awerte biqewime dibe ku Bakur jî weke Rojava rabe ser xwe û serkeftinê bidestbixin. Ji bo wê jî îro bi sedan siyasetmedar û kaseyetên bi bandor li ser vê pirsgirêkê şîroveyan dikin, sedî sed mirov nikare bêje wê pirsgirêka Kurd li Tirkiyê û Bakur çawa bê çareserkirin, lê xuya dike ku tenê bi rêûrêbazên demokratîk dikare çareser bibe”.

**‘Gelê me di 50’î salên dawiyê de ji bo azadiyê, xwe pêşxistin’**

Hozan Dîno bi van nirxandinan axaftina xwe bidawî kir: “Rojava yê Kurdistanê bûye mînak ku em ê çawa bikaribin pirsgirêkên xwe çareser bikin. Tişta ku ez dikarim di dawiyê de bîjim; Di rojhilata Navîn de ewqas geşedan zû diqewimin ku mirov nizane wê ji bo çi bêje, destê hemû Rojhilata Navîn di Kurdistanê de heye. Ji ber dewlemendiya Kurdistanê û axa wê a pîroz çavê her kesî li wê ye. Ji bo wê jî guharin rojane ne, lê Kurdistan wê sedî sed azad bibe. Divê em destê xwe bidin Şoreşa Rojava mezintir bikin ku bandoreke herêmî li ser perçeyên Kurdistanê yên din bike. Divê her kes Rojava biparêze û di rojevê de bihêlin ku em xwe zêdetir bidin nasandin û mafê xwe yên rewa bidestbixin. Weke me gotiye her perçeyek xwedî taybetmendiyekê ye, li Îranê hinek pêşveçûn çêdibin di aliyê sîstema miletî ve êdî hildiweşe, her wiha Îsrayîl dixwaze cîrantiyê bi Kurdan re bike. Ji ber bi rastî êdî ji Ereban têr bûne û gelê Kurd di 50’î salên dawiyê de ji ber pêdiviyên azadiyê xwe pêşxist, xwendin, zana bûn, îdeolojî û xwe naskirin. Bi taybetî torên civakî di belavkirin û nasandina pirsgirêka Kurd de, roleke sereke lîst bi rêya wê me xwe bi awayekî baş da nasanin. Ez jî weke hunermendekî dibênim ku ciwanên me, keçên me, dayîk û gelê me xwedî li çand û hebûna xwe derdikevin. Ev ji bo me avantajek mezine. Divê di vê serdemê de em pirsgirêka Kurd çareser bikin û him di aliyê leşkerî û him jî şoreşa xwe ya heyî mezintir û bihêztir bikin

Ez hîvîdar im pêşeroj, pêşeroja gelê me be û bê guman dawiya her şerî jî aştiye. Em hêvî dikin ku pêşeroja gelê me û miletên din yên cîhanê li ser kok û axa xwe bi azad bijîn û mafê xwe bidest bixin”.

# Hesen Mihemed Elî: Pêwîst e gelên Sûriyê bi hev re kongreyeke netewî li dar bixin

Endamê Desteya Serokatiya MSD'ê Hesen Mihemed Elî da diyarkirin ku bi hişmendiyekE tund û hişk Sûriyê nayê rêveberin û got: "Em bi hêvî ne, hikumeta Şamê biçe hevdîtinên li Parîse û bi riya Sûriyeke nenavendî gavên erenî bên avêtin"

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Di derbarê pêvajoya dawiyê ya ku li Sûriyê dimeşe, zextên li ser hikumeta Şamê û hevdîtinên li Parîsê, Endamê Desteya Serokatiya MSD'ê Hesen Mihemed Elî pirsên rojnameya Ronahî bersivandin û naveroka hevpeyvînê wiha bû:



**- Weke tê zanîn piştî ketina Rejîma Baas'ê li Sûriyê pêvajoyeke nû dest pê kir. Piştî wê pêvajoyê destwerdana dewleta Tirk bi karê hindirîn yê Sûriyê zede bû û gelek caran wezîrê dewleta Tirk yên karê derve Hakan Fîdan serlêdan kir. Hûn armanca bingehîn ya van serlêdanên Hakan Fîdan çawa dinirxînin û pişt perdê de çi diqewim e?**

Niha bi giştî nexşerêya Rojhilata Navîn ketiye di nav guhertinekê mezin. Planên ku bi hevpeymana Syces-Pîcot ve hatiye çêkirin ber bi guhertinê ve diçe. Ketina rejîma Baas'ê pergala Lozanê bidawî bû û Syces-Pîcot kete meriyetê. Ew plansaziyê bi şerê welatên beravê dest pê kir, bi bihara Ereban re hat domandin û sînor hatin bê wate kirin. Gelek kiryarên nû li herêman derxistin û niştecîhên herêmê re jî dan bawer kirin. Li Iraq û Başûrê Kurdistanê, bi avakirina hikumeta Federal ew pergale hat berdewamkirin. Bi wê jî armanca wan yan bingehîn ew bû ku pergala ku heyî navendî nebe û girêdayî yek destê we neyê meşandin bû. Li wir de, armanca bingehîn serweriya du welatan li herêmê zêde kirin bû yek Îran, yek jî dewleta Tirk bû. Piştre mêze kirin ku di herêmê de xurt dibin li ser Îranê êrîş hatin destpêkirin. Ji ber ku tevger û rexistinên weke Hûsî û Hamas re piştgrî didan û ew jî weke gef li ser herêmê dihat dîtin. Bi wê êrîşê ve, serweriya Îranê li ser Sûriyê û Libnanê hat şkandin û bû sedem ku Tirkiye jî bikeve din av dorhelekê mezin. Ew biryargehên Yewninastanê çêkiribûn û li ser sînorên Sûriyê avakiribûn hewldan kirin ku wan têk bibin. Di vê pêvajoyê de du xalên mezin tên armanckirin, yek Tirkiye dê nav vê pêvajoyê de çawa cih bibe? Ya duyem jî Israîl û Sûdî Erebîstan bi hevpeyman Brahîmî hewildidin ku Tirkiyê herêmê de lewaz û tengav bikin. Ew planên tên meşandin jî piranî li ser axa Sûriyê tên meşandin. Ez hezdikim bal bikşînim li ser xalekê bingehîn rola Tirkiyê ew pêvajoya nû tê meşandin taybet li Sûriyê û bi gelemperî Rojhilata Navîn. Dewleta Tirk ne weke leşkerî, di heman deme de jî ji aliyê aborî destwerdanê karê hundir yê Sûriyê dike. Ew rêya bazirganiyê ya ku Hindistan diçe Îmarat li vir de jî diçe Israîl û derbasî Ewropa dibe, li Tirkiyê de derbas nabe. Bi navê wê riyê kirin Rêya Pêşveçûnê û xistin meriyetê. Ew jî ji bona dewleta Tirk bû hincetek ku ya Tevgera Azadiyê dê têk bibe yan jî neçarî pere lihevkirinê bik e û di heman demê de ew kiryar û pêşketinên Sûriyê de çêdibin Tirkiyê pê bandor nebe. Ji ber wan sedemên bingehîn dewleta Tirk çûn li gel Rêber Apo ji bo pêvajoyekê bidin destpêkirin û hikumeta Tirkiyê di nav xeteriya têkçûyinê rizgar bibe. Hem aliyê aborî de têk çûbûn, ji ber ku rêyên bazirganiyê yên navnetewî ava bûn û di heman demê de jî serweriya Israîlê ya başûrê Sûriyê metirseyekê mezin li ser Tirkiyê ava kir. Ji ber ku armanca Israîlê ya mezin ew e ku xeta Dawûd li Sûriyê bidin avakirin ne. Ji ber wê jî pêvajoya Rêber Apo ya Banga Aşitî û Civaka Demokratîk bandora xwe li tevahî Kurdistanê bike bi taybet Rojavayê Kurdistanê bike. Tirsa wan ya mezin ew e ku ger pêvajo gehişt serkeftinê, dê Tirkiyê bikeve qonaxeke din û statûya Rojavayê Kurdistanê jî mîsoger bibe. Ji ber wê çend xalên bingehîn hatina Hakan Fîdan hene yê hatina Şamê yek; avakirina serweriya xwe li ser desthiladariya Şamê, du; ger dewleta Tirk destwerdanê karê hikûmeta Şamê neke, dê bi Rêveberiya Xweser ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Hikûmeta Şamê lihevkirinek di navbera wan de çêbibe. Fransa, DYA û Brîtanya di wan mijaran de li ser hikumeta Şamê ya veguhez de pir zext çêdike. Ji ber ku Tirkiyê bang nehatiye kirin ku tevlî hevdîtinên li Parîse hatibû daxuyandin ku bê kirin û taloq bû ne hate kirin tevlî ne kiriban. Ji ber ku berjewendiyên takekesî yên hikumeta Şamê li gel dewleta Tirk hene. Tirk tenê dibejin Rêveberiyekê xwecihî dikare bê avakirin lê Rêveberiya Xweser nayê pejirandin û ji bona xwe weke xeterî dibînin. Tirkiyê jî dixwaze ku pirsgrika Sûriyê di nav xweybûnê derbikeve bibe neteweyî. Weke tê zanîn di navbera QSD'ê û navbera dewleta Tirkiyê de agirbestekê demkî heye em dixwazin ew agirbest bibe mayinde û Sûriyê bibe heremekê bi ewle.

**- Alî û derdorên ku dibin asteng ji bona hevdîtinên di navbera hikumeta veguhêz a Şamê û Rêveberiya Xweser de sedema bingehîn çi ye û ji ber çi dixwazin astengiyan ava bikin?**

Hewildanên astengkirinê piralî çêdibin. Niha em bala xwe bidinê hikumeta Şamê ya vegûhez şêwaza vê ya rêvebirinê û pergala ku ji Sûriyê de hewildide pêş bixe berdewamkirina desthilatiya rejîma Baas'ê ye. Rêbazê wan yên ku li berava Sûriyê û Siwêda û Şamê pêk anîn, Sûriyê dixe dinav aloziyekê mezin de. Ew ji ber çi wan qirkirin û kiryaren li ser gel tînin ji ber ku nikarin peymana 10'ê Adarê pêk bînin û xwe didin rêbazên qirkirinê bingeh digirin. Ji ber ku naxwazin Kurd bibin hêz û gelên ku Sûriyê tevahî bijîn û xwe rêvebibin. Em hezdikin Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hevre rêve bibin lê ew hebûna gelan napejirînin. Ew dixwazin bi zextan vîna gelan radest bigirin bi hevkariya dewleta Tirk ji ber wê naxwazin hevdîtin pêk bên. Ev di hişmendiya ku em li ser dezgehên çapemeniyê yên şerê taybet û eşîrên pêkhateyên Ereb li hemberî Kurdan sor dikin û ji bona çareserî li Sûriyê ava nebe. Di heman demê de jî, hewil didin ku di asta navnetewî de zextekê giran ava bikin. Ya duyemîn jî astengiya herî mezin destwerdana Tirkiyê ya karê hundirîn yê Sûriyê ye. Tirkiyê naxwaze mijara Sûriyê di bin serweriya wê de derbikeve. Weke ku dibêjin "Mirî li Sûriyê ye, serxweşî li Tirkiyê be" gotin di cih dabe rewş wisa ye. Ji ber ku hevdîtinên ku li Şamê re pêktên Fransa û DYA yanî hêzên hevpeymana navdewletî dun av de ye. Ji ber wê Tirkiyê heznake ji aliyê navnetewî de, mafê Kurdên Sûriyê bê naskirin. Piştî ev serlêdana Hakan Fîdan ji Şamê berê de, hevpeymana 10'ê Adarê de gelek xalên ku bi herêmên Rêveberiya Xweser yên ku bixwe rêve bibe, weke ku perwerde, balafirgeha navnetewî û hwd. li hemberî wê xwestin ku Dêrazorê radestî hêzên hikûmeta Şamê ya veguhez bê kirin. Di hevpeymanê de jî rêvebirina van cihan bi şêwazekê komînal û hevpar bê rêvebirin be. Hikumeta Şamê li ser ragihandina xwe ya şerê taybet ku wê hevpeymanê Rêveberiya Xweser hez nake cîh bîne didin xuyakirin û ev nerast e, berovajî ye. Ev konferansa pêkhateyan ya li Hesekê hatibû lidarxistin weke peyam bû û dewleta Tirk ji wana re gotibû "Pêwîst e ku ev konferansa ku wan pêkanîba, we kiriba wan xwe kir hikmet û lidarxistin wan hezdikin we têkbibin" wisa hewildan alozîyekê kûr ava bikin. Di rastiyê da jî hêza hikumeta vegûhez ya li Şamê niha nîn e ku Sûriyekê bi hevpar rêve bibe. Tirkiyê jî hewil dide ku rewşa Sûriyê aloz bibe, ji ber ku Sûriyekê demokratîk pêk bê, cihê dagirkeriya Tirkiyê li Sûriyê namîn e.

**- Sedema bingehîn ya ku xwe vekêşandina hikumeta Şamê ya vegûhez ji civîna Parîsê çi bû û di heman demê de jî hûn weke nûnerekî MSD'ê nêrînen we li ser vê biryarê çi ne?**

Heya niha ti daxuyaniyên fermî ji aliyê nûnerên hikumeta Şame ve negihiştine destê me. Lê li ser dezgehên ragihandinê yên nêzî wan gotin tên gotin. Em weke MSD'ê bi hêvî ne ,ne rast be û xwe paş de nekişîn e. Ev agahiyên ne rast hewildana kûrkirina alozîyên di navbera gelên Sûriyê de ne. Ew gotin valaderxistina welatên hevpeymana navdewletî de cih digirin in. Em bi hêvî ne, ev gotin ne rast bin û hikumeta Şamê biçe Parîsê û pirsgirikên gelên Sûriyê li wir bên nîqaşkirin û bi wî awayî Sûriyeke nenavendî bê avakirin. Dibê ev agahiyên wisa kêmekê ji bona bertekên Rêveberiya Xweser û gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bê pîvandin tên gotin. Em weke MSD'ê bi israrin ku biçin û hevdîtin pêk bên. Ji ber ku hikumeta Şamê ne xweser tevdiger e û zext ji aliyên hêzên heremî re li ser wan tên kirin. Ji ber ku pirsgrêka Bakur û Rojhilatê Sûriyê êdî pirsgrikekê navnetewî ye. Ev hevdîtîn bila hezbikin Şamê bin, hezdike Parîsê bin hezdikin herêmên Rêveberiya Xweser bên kirin lê bingeha wê pêwîst e Sûriyeke nû ava bikin û gel bixwe rêve bibin be. Pêkhateyên Sûriyê pêwîst e hişmendiya Sûriyeke navendî xêlas bin û rêveberiyekî nenavendî û ya hemû ol, baweriyan bigire din av xwe de hebe. Demê rejîma Baas'ê de bi hişmendiya Erebî dihat rêveberin niha jî hewil didin bi Islamî rêve bibin. Ev nayê pejirandin û Sûriyê pirreng û pirzimanî ye. Em dixwazin bêjin ku em pêvajoyekê girîng de derbas dibin û çarenûsa gelên Sûriyê dî bê diyarkirin. Pêwiste em gelên Sûriyê tevahî bi hevre kongirekê netewî lidarbixin. Ji ber ku niştecîh û welatiyên Sûriyê di wê astê da ne ku bi xwe rêve bibin û hêzekê pir mezin heye. Ji ber ku hewcedariya Sûriyê ji aşitî û demokrasîyê heye. Ev konferansa ku 8'ê Tebaxê jî hatibû lidarxistin peyameke girîng ya hewildanên demokrasiya Sûriyê bû.

## Konfransa Hesekê… Barê Rêveberiya Xweser girantir kir!



**Dilyar Cizîrî**

Roja înê li bajarê Hesekê yê Rojavayê Kurdistanê konfransa yekrêzî û yekhelwestiya pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate lidarxistin. Zêdeyî 400 kesên nûnertiya hemû pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê beşdarî bûn. Di dîmenan de jî pirengî û beşdariya nûnerên pêkhateyan diyar bû. Balkêşe lidarxistina konfransa Hesekê di demekê de civaka navdewletî û hêzên destê wan di Sûriyê de heye, li riyeke çareseriyê digerin, hate lidarxistin.
Di heman demê de hikûmeta veguhêz a Sûriyê bi serkêşiya HTŞ'ê bi gavên ji dema ketina rêjîma Esed û heta niha nikarin gavên xwe bixin xizmeta çareseriya aloziya Sûriyê. Berûvajî heta niha gavên wan ji "kongreya niştimanî" bigre, erkdarkirina wezîran û heta danaşîna dûstûrê li ser xeta hikûmeta berê ya Beşar El Esed tevdigere. Hîn jî nikarin li gorî demê û pêwistiyên aloziya Sûriyê guhertinekê bidin jiyankirin.
Bi komkujiyên Perava Sûriyê û Siwêda ev rastî hîn zêdetir isbat dibe. Di hemû gavên wan de destwerdana hêzên derve diyar in. Hikûmeta Beşar El Esed elewî bû, bi biryarên Rûsiya û Îranê tevdigeriya. Hikûmeta veguhêz a Ehmed El Şeri siniyê bi fermana Tirkiyê û Qeter tevdigere. Bi wate zihniyet û naverok yek e. Tenê di mijara mezhebî, hêzên piştgir de guhertin hatiye çêkirin.
Hêzên navdewletî ji destpêkê de dibêjin ew rewşa hikûmeta veguhêz dişopînin û li ser wî esasî di mijara naskirin û hevdîtinan de gelek gav hatin avêtin. Lê piştî piratîka behsa mijarê êdî nêrîna hêzên navdewletî û yên destê wan di dosya Sûriyê de heye, têne guhertin.
Konfiransa Hesekê di vê navberê de gaveke mezin û bi hêz a Rêveberiya Xweser û pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bû. Beşdarbûna nûnerên rûhî yên elewî û durziyan, di heman demê de nûnerên xiristyan û nûnerên hin pêkhateyan ên di dema hikûmeta berê de newêrîbûn xwe nêzîk bikin, giraniya konfiransê mezintir kir.
Ev konfrans di gelek sazî û dezgehên ragihandinê de bû rojeva sereke, çav ji gelek aliyan ve li Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekir. Tişta bi salan li vir tê gotin ku xweserî riya çareseriya tevahî aloziya Sûriyê ye, isbat bû. Kesên di bin zextên dewleta Tirk de çavên xwe li vê rastiyê digirtin, piştî pêêketin û guhertinên têne jiyankirin, mecbûr man vê nêrînê aşkere bikin. Ev rastî barê rêveberiya xweser girantir dike. Berê çavên xelkên Bakur û Rojhilatê Sûriyê li vê rêveberiyê û hêzên wê yên leşkerî bû. Lê niha diruşmeya me bi salan beriz dikir, zindî bû. Ev jî bar û berpirsyariyê girantir dike. Îro çavên Siwêda, Perava Sûriyê, herêmên hindir û her kesên li dijî tundiyê ne li sîstema rêveberiya xweser e.
Li ser vî esasî rêveberiya xweser a di gelek qadan de gavên mezin avêtiye, di warê civakî û rêxistinî de di hindirê xwe de lawaziyan jiyan dike. Tevî zêdeyî 10 sal in rêveberî hatiye avakirin. Nûnerên herêmê ji hemû aliyan cihê xwe di nav de girtin, lê hîn kêmasiyên têne jiyankirin, pirin. Balkêşe barê qadên civakî, siyasî û diblomasî jî li ser pişta hêzên leşkerî û QSD'ê birêve diçe. Ji bo serkêşiya meydanek wekî Sûriyê pêwîste di zûtirîn dem de sererastkirin werin çêkirin.



# Ibrahîm Şêxo: Li herêmên dagirkirî kiryarên dijmirovî berdewam in

Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Ibrahîm Şêxo diyar kir ku li herêmên dagirkirî yên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî binpêkirin û kiryarên dijmirovî berdewam dikin. Şêxo ragihand ku li wan herêman rojane welatiyên Kurd tên işkencekirin, revandin û kuştin.

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Di derbarê rewşa dawî a herêmên dagirkirî yên mîna Efrîn, Serêkaniyû û Girê Spî de Berpirsê Rêxistina Mafê Mirovan Efrîn-Sûriyê Îbrahîm Şêxo bersiva pirsê Rojnameya me da û hevpeyvîn wiha bû:

**Bi geşedanên dawî yên ku li Sûriyê qewimî ne, gelek guhartin û veguhertin hatin çêkirin. Komên Çeteyan yên li herêmên dagirkirî ji vê yekê fersend dîtin û kiryarên dijîmirovî li ser gel bi taybet li Efrînê zêdetir kirin. Hûn vê yekê çawa dinirxînin?**

Li seranserî Sûriyê binpêkirinên mafên mirovan belav dibin û hovîtî zêde dibe, herwiha kuştin û revandina mirovan zêde dibe. Hêviya gelê Sûriyê ew bû ku piştî ketina rêjîma Baas û hatina hikumeta veguhêz a Şamê Sûriyeke wekehev û Demokratîkî were avakirin. Di heman demê de, hêviya koçberên herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî ew bû ku vegerin cih û warê xwe, lê ev yek pêk nehat. Ji ber ku hikumeta veguhêz a Şamê kesên biyanî di nava rêveberiya xwe de erkedar dikin û rojane komkujiyan li dijî gelê Sûriyê pêk tîne. Hin ji koçberên bajarên Sûriyê vedigerin cih û warê xwe, lê komên çeteyan li herêmên dagirkirî mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî li cihê xwe man û hin ji wan çeteyan xwe ji herêmên dagirkrî vekşandin. Komên çeteyan yên herêmên dagirkirî navê xwe guherandin û hejamarek ji wan tevlî hikumeta veguhêz a Şamê bûn. Ev tê wateya ku komên çeteyan di bin navê hikumeta veguhêz a Şamê de hatin parastin, heta niha li herêmên dagirkirî sûcên berê tên kirin û kuştin, revandin û binpêkirin didomin. Berî niha li herêmên dagirkirî komên çeteyan navên wan diyar bûn, lê niha li wan herêman navê wan komên çeteyan ne diyarin.

**Di demên dawiyê komên çete xwestin bidin xuyakirin ku li Efrînê aramiyek çêbûye, lê rûxmî vê jî girtin, revandin, kuştin û talankirina xwezayê, mal û milkên gel tê kirin. Gelo armanca wan ji vê siyasetê çi ye?**

Komên çeteyan weke her car ev yek bikar anîn û dest davêjin kesên ku vegeriyane ger demkî be yan demdirêj be. Di van demên dawiyê de gelek kes hatin girtin û revandin ku ji wan bace tê xwestin, herwiha piraniya malbatên ku vegeriyane nikarîne mal û milkê xwe bidest bixin, da ku bidestbixin jî ji wan baceyek mezin bi dolar tê xwestin. Komên çeteyan yên navê wan ne diyar li herêmên dagirkirî û bi taybet Efrînê binpêkirin û diziyê dikin, rojane mirovan direvînin û dikujin. Di dawiyê de ev komên çeteyan nayên nasîn ku kî ne û hikumeta veguhêz a Şamê ji wan çeteyan re dibêje ku dizî çêbûye û dema xwediyê malê gilî dike, ji xwediyê malê re dibêjin ku ev yek ne girêdayî me ye. Ev yek dide diyarkirin ku lawaziya hikumeta veguhêz a Şamê heye û têkilyeke di navbera wê û komên çeteyan de jî heye. Li herêma Efrînê mal û milkê gelên Kurd talan dikin, heta niha li Efrînê sûcên şer, qirkirin berdewam dikin û heta niha tu çareserî di Efrînê de çê ne bûye. Di vê demê de gelek gotin tên gotin ku li herêma Efrînê aramî heye û dibêjin ku binpêkirin kêbûne, lê mînakên wan berdewamin. Ji ber ku tu çareserî tune ye û talan kirin ji dema berê zêdetir bûye. Siyaseta wan a guheritina demokrafîk berdam dike. Komên çeteyan dixwazin ku wê siyaseta xwe a qirêj bihêlin, rêvebertiya Efrîn di dest wan de be. Lewma komên çeteyan dixwazin ku tirsê di dilê gel de çêkin, da ku gelê resen ve negerin li ser cih û warê xwe. Di heman demê de, dewleta Tirk a dagirker dixwaze ku li ser erdê guhertina demografîk pêk bîne.

**Efrîn di bin dagirkerî û kontrola dewleta Tirk a dagirker de ye, ji bo bidawîkirina van sûcan û pêkanîna vegerke bi ewle a gelê Efrînê, pêwîst e gavên çawa ji aliyê hikumeta veguhêz a Şamê û Tirkiyê ve bên avêtin?**

Hikumeta veguhêz a Şamê erkê wê ye ku parastina gelê Sûriyê bike. ji ber vê yekê divê ku ev hikumet bi erkê xwe rabe û komkujiyê ku niha li dijî gelê Sûriyê pêk tîne, rawestîne. Di 10'ê Adara 2025'an de di navbera Serokê giştî yê Hêzê Sûriya Demokratîk Mezlûm Ebdî û Serokê hikumeta veguhêz a Şamê Ehmed El-Şera de hevpeymanek çêbû. Li ser gelek xalan hatin nîqaşkirin û erkêkirin, xala vegera koçberan xala pênca bû. Herwiha pêwîst e hikumeta veguhêz a Şamê xala vegera koçberan a bi ewle pêk bîne. Da ku koçberên herêmên mîna Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî vegerin li ser cih û warê xwe û komên çeteyan ji wan herêman xwe vekşînin. Helbet wê demê aramî li herêmê çêbibe û hikumeta veguhêz a Şamê dikare di derbarê vê yekê de lihevkirinekê bi dewleta Tirk a dagirker re bike. Di heman demê de, jî pêwîst e dewleta Tirk a dagirker jî bi erkê xwe rabe û êdî bes piştgirî bide komên çeteyan yên li herêmên dagirkirî. Lewma divê ku kesên sûcdar werin cezakirin û dewelta Tirk a dagirker xwe ji tevahiya Sûriyê vekşînine, da ku aşîtî li herêmê pêk were.



## Çima civîna Parîsê nayê lidarxistin?



**Zekî Bedran**

Weke tê zanîn ji bona li ser mijarên Sûriyê bên nîqaşkirin divê civînek li Parîsê hatiba lidarxistin. Di civîna demên berê de pêwîste hatiba kirin, hikûmeta HTŞ'ê tevlî nebû û hat taloq kirin. Hincetên hikûmeta Şamê ew bû ku qaşo bûyerên li Siwêda hatibûn qewimandin bû. Ajansa fermî ya nûçeyan a hikumeta veguhêz ya Şamê Sana vê carê ji raya giştî re ragihand ku hikûmeta Şamê dê beşdarî civîna demên pêş hatibû plankirin jî nebe. Sedema wan ya bingehîn konferansa li Hesekê hatibû lidarxistin bû! Di civîna ku behsa wê tê kirin de nûnerên ji hemû beşên civakê yên Sûriyê beşdar bûn. Nûnerên hikûmeta Şamê ev civîn wekî hewldanek ji bo parçekirina Sûriyê û hewldanek ji aliyê QSD'ê ve ji bo şikandina peymana ku di 10'ê Adarê de bi Şamê re hatibû kirin, bi nav kirin. Hîkmet Hîcrî û nûnerekî Elewiyan jî beşdarî civîna li Hesekê bûn. Xuyaye ku hikûmeta Şamê ji ber tevlîbûna van kesan pir aciz bûye. Li şûna ku wan wekî beşek ji rastiya Sûriyê bibîne, ew wan wekî dijmin dibînin. Hikumeta Şamê nikare van beşên civakê bike yek. Wan rêbazên pêkanîna yekîtî û tevlêbûna neteweyî terikandine. Ew her tiştî bi xwe ava dikin, biryaran didin û her tiştî bi xwe birêve dibin. Yên ku hişmendiyeke cuda bifikirin tên dûrxistin. Di vê rewşê de, yekîtiya Sûriyê dê çawa were bidestxistin?
Di komxebata Hesekê de, hemû beşên civakê helwesteke yekgirtî dan nîşan dan. Bi gotineke din, wan peyameke dabeşker nedan, lê berovajî vê peyameke yekgirtî dan. Daxuyaniya dawî ya civînê li ser vê yekê teqez kir. Behsa veqetandin, dabeşbûn, an avakirina hikumeteke cuda nehat kirin. Ev helwest dikare wekî piştgirî ji bo civîna ku dê li Parîsê were lidarxistin were şîrovekirin. Li derveyî Şamê, tu şîroveyên neyînî nehatin kirin. Ajansa nûçeyan a Sana ji bo vekişîna ji civîna Parîsê çavkaniyên hikûmetê nîşan da. Lê, hikumetê hîn daxuyaniyek fermî nedaye. Sana bêyî agahdariya hikûmetê wê agahdariyên wisa belav neke. Tê zanîn ku hikumet niyeta wê heye ku beşdarî civînê nebe. Lê, daxuyaniyek fermî dikare wan bixe rewşek dijwar. Di şûna wê de, dibe ku ew hewl didan ku bi belavkirina vê nûçeyê bertekê bipîvin. Ger bertekên tund hebûn, dê derî ji bo beşdarbûnê vekirî hatiban hiştin. Tê zanîn ku DYA, Fransa û Brîtanya dê beşdarî civîna Parîsê bibin. Şam di vî warî de hewl dide ku ji civîna Parîsê dûr bikeve. Ew ê nikaribe biryarên ku li wir hatine girtin ji bo demek dirêj bi awayekî keyfî bi cîh bîne. Biryar dê bêtir girêdayîbin. Ev ji ber ku hikûmeta Şamê çandeke lihevkirin û hevkariyê bi hêz û nêrînên cuda re tine ye. Hişmendiya wan hişk e û li ser bingeha xulamiyê ye. Nêzîkatiya wan a li hember pirsgirêk û daxwazên navxweyî bi kiryarên wan ên li dijî Elewî û Durziyan hatiye nîşandan. Nêzîkatiya wan a li hember Rêveberiya Xweser ew e ku li ser wan serweriyê ava bike. Yên ku radest nabin wekî dijmin têne hesibandin. Bi rastî, dij-propagandaya wan û gefên wan ên li dijî herêmêm Rêveberiya Xweser zêde bûne.
Me diyar kir ku hikûmeta Şamê naxwaze beşdarî civîna Parîsê bibe, lê hîn aliyê din hen e, bêtir li dijî wê ye. Ew jî hikûmeta Tirkiyê ye. Ew Enqere ye ku di vê mijarê de ji hikûmeta Şamê re peşengtî û wê gur dike. Bi rastî, dema ku civîna Parîsê hate ragihandin, wezîrên Tirkiyê dest bi hatina Şamê kirin. Daxwaz û zextên ji bo bêçekkirina QSD'ê û têkbirina Rêveberiya Xweser bi giranî ji Enqereyê tên. Gefên Enqereyê yên li dijî Rêveberiya Xweser jî dest pê kirine zêde dibin. Çalakî û êrîşên ku herêma xweser armanc digirin zêde bûne. Enqere beşdarî van civînan nabe, wekî ku li Astanayê kir. Wekî din, ew naxwaze pirsgirêka Kurd derbasî komxebateke navneteweyî bibe. Her çend civîn li ser navê Rêveberiya Xweser û QSD'ê bên lidarxistin jî, Kurdên cudaxwaz jî tê de beşdar in. Tirkiye hemî hewildanên xwe ji bona ku Kurd tê de hene asteng dike. Pêvajoya Astanayê bûye pêvajoyek li dijî Kurdan. Rûsyayê Rêveberiya Xweser vexwendibû civîna mezin a li Soçiyê, lê Tirkiyê destwerdan kir, bi wan re li hev kir û Rêveberiya Xweser jê derxist. Bi heman awayî, rê li ber beşdarbûna Kurdan û Rêveberiya Xweser a Komîteya Destûrî ya Cenevreyê girt.
Em nizanin ka DYA û Fransa dê çiqasî giranahiya xwe li ser pêvajoyê bikin. Lê wan jî nas kir ku yê nêzî çareseriyê nabe hikûmeta Şamê ye. Şam ne tenê gavan navêje, Rêveberiya Xweser tevlî biryarên ku digire nake û her wiha wan sûcdar dike. Ew propagandaya xwe li ser pêngavên xwe li ser têkbirina Rêveberiya Xweser diavêjin. DYA û dewletên din bi her du aliyan re di goftugûyon de ne û di rewşekê de ne ku fêm bikin ka kî nêzîkî wan dibe. Pirs ev e ku ev dewlet dê çiqas bi bandor û dadperwer tevbigerin. Ew jî hay jê nînin ku Tirkiye di bingeha pirsgirêkê de ye. Di encamê de, hikumeta Tirkiyê dijminatiya xwe ya li hember Kurdan didomîne. Ew Sûriyê dixe nav şerekî navxweyî yê nû. Ew Kurdan dixe nav pençên qirkirinê. Ew îdîa dikin ku ew bi Kurdên li Tirkiyê re birayê hev in, lê ew di Sûriyê de jî dafikên kujer jî amade dikin!

## 15'ê Tebaxê û QSD



**Farûk Sakik**

Sûriye di pêvajoyeke pir hesas re derbas dibe. Bajarê Hesekê di 8`ê Tebaxê de malovanî ji kombûneke dîrokî ya bi navê "Konferansa Yekhelwestiya Pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê" kir. Konferans bi tevlîbûna nêzî 500 nûnerên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk, saziyên siyasî, leşkerî û ewlehî û nûnerên ji pêkhateyên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê pêk hat.
Vê konferansê nîşanî hemû cîhanê da ku gelên herêmê dixwazin bi awayekî wekhev û azad bijîn. Gelên li Sûriyê bawerî bi sîstema 'xweseriya demokratik' anîn. Yek armanceke hevpar hebû, ew jî Sûriyeke Demokratîk bû. Di heman deme de, li Fransayê amadekariya civînek di navbera Rêveberiya Xweser û rêveberiya Şamê de pêk bihata hebû. Herdu aliyan ji berê de deklere kiribûn ku wê tevlî vê civînê bibin. Kesên xêrnexwaz-şerxwaz timî dixwazin li Sûriyê fitne û xerabiyan pêş bixin. Ji van xêrnexwazan yek jî Tirkiye bû. Li Tirkiyê eniya şerxwazan di nav liv û tevgerêde ne. Rojek beriya Konferansa Hesekê, du roj beriya civîna Parîsê, Hakan Fîdan şandin Şamê. Hakan Fîdan nikaribû pêşî li konferansa Hesekê bigire lê pêşî li civîna Parîsê girt. Rêveberiya Şamê rojek beriya civînê daxuyanî da ku wê neçin Parîsê.
Piştî sefera Hakan Fîdan a Şamê, li herêmê êrişên çeteyên HTŞ'ê dest pê kirin. Di demeke wiha de mafdariya hebûna QSD'ê hat îspatkirin. Di van geşadanên li Sûrî carek din da xuyakirin ku pêdivî bi çek û xweparastinê heye. Karesatên hatin serê Durzî û Elewiyan jî ji xwe tê zanîn. Heger Kurd vê qederê nejiyabin sedem hebûna QSD'ê bû. Di destpêkê de dixwazin çek ji dest wan bigirin û piştre dest bi komkujiyan bikin. Piştî ku PKK'ê li hemberî dewleta Tirk têkoşîna çekdarî daye sekinandin, QSD jî hat nîqaşkirin. Murat Karayilan jî bersivek da van nîqaşan û digot: Çekberdan mijareke cuda ye. Ew mijareke taktîkî ye. Çawa? Li kîjan welatî şert û merc çawa bin, li gorî wê têkildarî bê ka çek hewce ye yan na dikare biryar bên standin. Mijarên taktîkî ne mijarên jiberkirî ne. Mesele hêzeke çekdarî ye. Ger wê li dewletê yasayên ku baweriyê didin, nebin û li hemberî hebûna wan êrîş werin kirin, wê demê helbet wê xwe bi rêya çekan biparêzin!
Rêber Apo hêviyek dît ku dewleta Tirk, dest bi qanûnên ku baweriyê didin kiriye. Ji bo çareseriyê ev serdem da destpêkirin. Lê li Sûrî dewlet tune da ku qanûnên wê hebin. Karayilan jî behsa heman tiştî dike. Ger wê li dewletê qanûnên ku baweriyê didin, nebin û li hemberî hebûna wan êrîş werin kirin, wê demê helbet wê xwe bi rêya çekan biparêzin. QSD'ê ev hêz e.
Divê ku were gotin, beriya 15'ê Tebaxê hêviyên ku dewleta Tirk di qanûnên xwe de bide Kurdan, tunebûn gelo? Na tunebû. Ji êrişên li ser Rojava yên îro talukettir, îmha, înkar û asîmlasyon hebû. Ji bo Bakurê Kurdistanê 15'ê Tebaxê, QSD ya Rojavaya îro bû.Têkoşîna çekdarî û şer a di 15'ê Tebaxa 1984'an de destpêkir, piştî demek gihîşt radeyek ku êdî dest bi siyaseta demokratîk bike. Êdî dem dema aştiyê bû. Dema siyaseta demokratîk bû. Lê zihniyeta Hakan Fîdan ên îro, wê demê li Tirkiyê îqtiîdar bûn. Şerxwaz desthilat bûn. Di şer de israr kirin û Kurdan ji wê rojê heta roja me gelek êş kişandin. Rêber Apo dixwaze dawî li van êşan bîne. Îro hebûna QSD'ê jî, ji bo li Rojava zêde êş neyên kişandine.